
amed tîgrîs

# Nîşan û Dawet



APEC

Institut kurde de Paris

16/05/2017
320 TIG NIS

amed tîgrîs

# Nîşan û Dawet

Ji Instituya kurd re!

13.09.91

A. Tîgrîs

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

Stockholm 1991

Nîşan û Dawet

**amed tîgrîs**

**Weşan no: 12**

Institut kurde de Paris

**Utgivare/Weşanxane:**
**APEC-TRYCK & FÖRLAG**
**ÇAP Û WEŞANXANA APEC**

**Författare/Nivîskar:**
**amed tîgrîs**

**Adress/Navnîşan:**
**Box: 3318, 163 03 Spånga/SWEDEN**
**Telefon: 08-761 81 18 • Telefax: 08-761 24 90**

**Tebax 1991**

**ISBN: 91 87730 07-3**

# Naverok


Pêşgotin ........................................ 5
Hevdîtina keç û xortan ........................................ 9
Bûkbazî ........................................ 10
Bi gelemperî dawiya keçrevandinê mirin e ........ 11
Herêkirin û bardanîn ........................................ 12
Salixdana bûkê ........................................ 16
Belavkirina bişare ........................................ 16
Şiranî ........................................ 18
Şiraniya biçûk ........................................ 19
Şiranîaya mezin ........................................ 20
Qelendbirîn ........................................ 22
Karûbarên serûgo ........................................ 26
Gazikirinadawetê........................................ 28
Dawet ........................................ 29
Lîstikên li der ........................................ 34
Lîstikên li hundir ........................................ 41
Traşa zavê ........................................ 44
Şeva desthene û serhenê ........................................ 47
Serşûştina bûk û zavê ........................................ 54
Lêkirina kincên zavê ........................................ 55
Şabaş ........................................ 57
Nivîsandina cihêzên bûkê ........................................ 59
Guhaztina bûkê ........................................ 60
Tirşik ........................................ 81
Mehrbirîn ........................................ 83
Parastina bûk û zavê ........................................ 86
sêroj ........................................ 88
Zeyî ........................................ 90
Ferhengok ........................................ 93


Institut kurde de Paris

*"Bila Keça şivan be,*
*Lê bûka malan be!"*

***Gotina pêşiyan***

Institut kurde de Paris

# Pêşgotin

Xwendevanên hêja!

Kultur ne helberînên karûbarên çend salan e. Ew, encama hemû zanîn û hilberînên dûr û dirêj yên dîrokî ye. Ango ew jîyana gel a dîrokî bi xwe ye. Ref bi ref mirov kal û pîr dibin û dimirin, lê jîyana wan ya tal û tirş, keser, şahî, xweşî û afrandinên wan ji zarokên wan re dimînin. Dîyar e, ku jîyana mirov kin e. Lê ya kulturî dûr û dirêj e. Ew ji hebûna gel heta dawî dom dike. Herweha kultur encama hilberînên prossesa hezar salan e. Koma jîyanê ya dîrokî ye.

Ji ber vê yekê, dewletên dagîrker û hêzên nîjadperest, giraniya xebatên xwe yên polîtik didin ser asîmîlasyona ziman, kultura gel û neteweyên bindest û xizan. Di vî warî de, ev hêzên serdest xebata xwe ya asîmîlasyonê bi du alî didomînin. Ji alîyekî ve kultura gel û neteweyên bindest bi qanûnên xwe yên nîjadperest qedexe dikin; dixwazin wê bidin wendakirin û ji bîrkirinê. Ji alîyê din ve jî, ji bo asîmîlasyonê hemû hêz û navgînên xwe bi rêdixin. Di serdema me de, van hêzên dagîrker bi

Institut kurde de Paris

riya dibistan, mizgeft radyo, televîzyon, tîyatro, sîne ma, ordî, partî, rêxistinên sporê, girtîgeh û bi yên wekî din, di her alîyê jîyanê de, bi lez û bez asîmîlasyonê pêk tînin.

Dagîrkerên Kurdistanê van hemû metodên asîmîlasyonê li dij neteweyê Kurd , bi awayekî tûnd û dijwar bi kartînin. Talankirin û dizîna kultura Kurd li Rojhilata Navîn berdewam e.

Qedexekirin, talan, dizîn, asîmîlasyon, malaştin û ji bîrkirina kultura Kurd ji dewlet û hêzên dagîr ker re bûye kar û bûyerên rojane.

Bi pejrandina ola Islamî re, perda îslamê dikeve nav keç û lawên Kurd jî. Di şûna edetên xweser ên kurd de, edet, qanûn û perwerda Islamî cîh girtin. Ji ber vê yekê jî, dema mirov li xwazgînî, nîşan û dawetên Kurdan baş binêre, ji wan jêbermayî û kultura îslamî li hinek ciyan dibîne. Lê, wek her gel û neteweyê îslamî, Kurdan jî edetên xwe û yên îslamiyê bi hevdu re hûnan e. Ta carnan mirov nikare wan ji nav hevdu derîne. Ji vê kultura Kurd perçek jî xwazgînî, nîşan û dawet in.

Kurd, sal bi sal ji sedemên curbe cur ji van jêbermayîyên xwe dûr dikevin û wan wenda dikin. Di van 20-30 salên dawî de, min bi çavên serê xwe gelek tiştên guhartî dîtin, ku çawan jêbermayiyên Kurd ji navê radibin. Di bin van hoyên giran û zorbe de, çend sal paşê dê gelek jêbermayî yên me yên din jî wenda bibin. Ji vê yekê jî min biryar da, ku xwazgînî, şîranî (nîşanî) û daweta Kurdan yên ku min bi çavên serê xwe dît û bi xwe jîyam binivîsim.

Di dema nivîsandinê de min dixwest ji her perçe û herêmên Kurdistanê mînak bidim. Ji ber vê yekê min ji herêmên Dîyarbekir, Bedlîs, Cebexçûr, Riha, Mêrdîn,

Institut kurde de Paris

*"Ne jina kenokî,*
*ne mêrê şermokî!"*

**Gotina pêşiyan**

Institut kurde de Paris

## Hevdîtina keç û xortan

Îro mirov keç û jinên Kurd bi awakî hêsa ji hevdu derdixe. Keçên gund û bajaran servata (serserqot) ne. Porên wan dirêj û du kezîyên wan yên hunandî (vehandî) li pişt wan in. Lê yên bajaran carnan çîtên rengîn li serê wan in. Jin jî serê xwe bi melhêfa spî dipêçin. Li hinek herêman jin biskên xwe çêdikin. Heta çend sal berê hemû jin bi kofî bûn û heta 50-60 sal berî jî keçên Kurdan kum û kofî girê didan. Kofîyên jinên her herêmî ne wek hevdu bûn. Kofîyan bi şehr û temûziyan dipêçan. Kofîyên herêmên Licê, Darahênê û Pasûrê ji yê herêmên din cudatir bûn. Girêya kofîyên wan, li pêş serê wan wekî kiloçê gayî bilind bûn û melhêfa spî davêtin ser. Kofîyên wan wekî kofîyên İskîtiyan in; yên ku wê demê li ser keviran hatine çêkirin. Niha jî, hinek pîr bi kofî ne, lê jinên ciwan êdî kofî girênadin. Kum û kofîyên herêmên deştê ji yên çiyê cudatir in. Berfîreh û kiloçên wan tunin. Perik û zêrik bi kumên wan ve ne. Yên welatê Serhedê jî berfîreh û kofîyên wan li paş serê wan in. Ji derê serî, kinc û girêdana jin û keçan wekî hev in. Lê, taybetiya kinc û girêdana xort û mêran tune.

Piraniya xort û keçan hevdu li ser kanî, li ber paleyî, bêrî, rezan, bêder an jî di şahî û şînan de hevdu dibînin. Kaniyên Kurdistanê, bergeh û serçaviyên dilketin û bengîntiyê ne. Dema xort bixwazin keçan bibînin, an diçin ser kaniyê, an jî li ser riya wan radiwestin û bi çavan nêçîrên keçan dikin. Xort, ji bo ji nêz ve keçeke bibîne, ew carnan zerikek (tasek) av ji keçikê dixwaze. Dema zerik (tas) tune be, satila keçikê ya avê bi serê xwe de dike. Lê, bi çavan li keçikê dinêre. Keçik jî her çiqas şerm

dike û serê xwe dike ber xwe, lê ew jî, di bin çavan de, li xort dinêre. Gelek caran satilên vala li riya kaniyê dimînin û xort û keç destên hevdu digrin û ber bi çiya, an çol û peseran ve direvin... Carnan jî, xort û keç sozê revandinê didin hevdu. Bi şev dema malbata keçikê dikevine xew; ew boxça xwe digire di dergeh an jî di pencerê de derdikeve û bi lawik re direve. Di nav Kurdan de hin di dema zaroktiyê de zarokên lawîn xwe fêrî keç revandinê dikin.

## Bûkbazî

Li hinek herêman, bi taybetî li dorhêla Semsûrê (Adıyamanê) zarok lîstika Bûkbazî dilîzin. Zarokên lawîn hin di dema zaroktiya xwe de fêrî keç revandinê dibin. Zarok dibin du kom. Hejmara wan di navbera 7 û 12-an de tê guhartin. Komika aliyê zavê û komika aliyê bûkê. Peyayekî dikin bûk û yekî jî dikin zavê. Du kesên beza jî dibin parazgerê zavê. Lîstik dest pê dike. Kî sê caran destê xwe li pişta yê din bixe, ew dimire. Yani ji lîstikê derdikeve. Zavê bi xwe nikare bûkê birevîne. Divê hevalên wî bûkê birevînin û bînin destê wê bikin nav destê zavê. Zavê, wê çaxê bûkê digre û tîne cîhê ku lîstikê dest pê kiri bû. Wê çaxê lîstik diqede. Aliyê bûkê jî têdikoşin, ku ew bi ser nekevin. Bi piranî ev lîstik bi şev di tavehîvê de, li der tê lîstin.

# Bi gelemperî dawiya keç revandinê mirin e

Li hinek herêman revandina keçan tiştekî adetî ye. Ew xortê ku keç nerevîne, ne hêja ye. Lê, li hinek herêman jî kuştin dozê safî dike. Carnan piştî xebera revandinê, malbata keçikê bi çiya, gund û bajarên derdorê dikevin, li keçik û lawik digerin.

Li hinek herêmên rojavayê Kurdistanê, heger mala bavê keçikê heta 30-40 rojan wan bi dest nexin, pişt re, li hevdu tên. Heger wan bibînin herduyan jî di cîh de dikujin. Carnan10 sal jî di ser revandinê re derbas bibin, dîsan dilîve (fersend) bibînin keçikê, an lawik dikujin. Li gor rewşa herêm û malbatan, rewş tê guhartin. Heger malbata lawik gelek xurt be û ya keçikê jî qels be, malbavê keçikê nikarin tiştekî bikin û naxwazin li hevdu jî bên, wê çaxê hîç nebe şîrên xwe li keçikê heram dikin û wê ji keçitiya xwe davêjin. Carnan jî, piştî revandinê kes û malbatên gire-gir dikevin navberê û wan li hev tînin. Li hinek herêman jî, dema ji keça revandî re zarok dibe, keçik zaroka xwe digre û diçe mala bavê xwe. Dayik û bav êdî wan dibexşînin û didine xatirê neviyên (torinên) xwe. An jî, keçik û lawik seriyek sabûn û kefenên xwe, bi xwe re dibin û bi tena serê xwe diçin mala bavê keçikê û dibêjin; " an me bikujin, an jî efû bikin." Wê hingê bavê keçikê wan efû dike...

Di nav Kurdan de her çiqas bi keçrevandinê re kuştin û koçkirin tên, dîsan jî bûyerên keçrevandinê gelek dibin. Ji ber ku edetên mîrîtî, eşîrtî û dînî hîn xurt in. Xizanî û belengazî van hoyana hîn xurtir û girantir dikin. Ji ber van sedeman xort û keç nikarin bi dilê xwe bizewicin. Çareya herî dawî revandin e. Dilgirtin, ji mirin û koçkirinê natirse.

## Herêkirin û bardanîn

Piraniya wan keç û xortên ku di eyni gund, bajar û bajarokî de nebin, hevdu nabînin û nasnakin. Bê dîtin û naskirna wan, bav û dê biryar didin û keçikê ji lawê xwe re dixwazin. Êdî şeva zewacê ew û qismetê xwe; çi derket: Kor, kut, leng, gurî.... Heta van salên dawî jî, bav û dayikan bi xwe biryara zewcandina law û keçên xwe didan û her tişt wek biryara wan dibûn. Lê, hezar mixabin hîn jî li hin herêman ev yek heye, lê ne wek berê ye. Sal bi sal kêm dibe. Li gelek herêman hîn zarok di landikê (dergûşê, bêşîkê) de ne, wan ji hev re herê dikin. Bi taybetî dotmam û kurapan...Dema ku ew mezin dibin û tên çax û benga zewacê, lec û sergêjîyên mezin derdikevin.

Carnan dê û bav keça xwe ya 16-17 salî didin kalê 60-70 salî. Sergêjîya herî mezin yek jê jî ev e. Di rewşên weha de, an zarokên kalo ên lawîn tunin, an kalo dewlemend e, an jî xwînî ye. Di vî warî de gelek mînak hene. Strana Xalê Cemîl, ya herî berbiçav û jîndar e:

### Xalê Cemîl

Erdem dibêje:

- Xalê Cemîl, Xalê Cemîl, Xalê Cemîl
Xalê Cemîl wez gune me
Lo lo Xalê Cemîl min heyrano
Welle tû extîyarî dîno wez gede me.
Lo lo Xalê Cemîl emrê te çûye çil û şeşan

Wez çardeh me
Lo lo Xalê Cemîl malşewityo
Ji min veger wez stûxwar û bê çare me
Xalê Cemîl malşewitiyo
Wez ne pariyê devê mûrdarê fena te me
Xalê Cemîl wez gune me

Xalê Cemîl dibêje:
- Lê lê Erdem Xanimê sibeye
Li min û li dîyarê Qerdîlekê
Lê lê Erdem Xanimê min heyranê
Qamkinikê, lê meşwerdekê
Welle tu wê guhê xwe mede
Qise û galegal û gotinê Şeytan û fesadan
Lawo fesadîya xelkê
Bila Xwedê te'ala biqedîne
Miradê min û Erdem Xanimê
Şevek ji şevê payîzê heta sibê
Bira wê çaxê li ser singa min peya be
Qasidê mîrata qolfelekê
De gidî lê lê, lê Erdemê
Dê gawirê, bav Ecemê
Ez ê qasekî rûniştima li kêlekê
Bila dîsa wa li cemê
Gidî lê lê,lê Erdemê.

(..........)

Carnan jî birayê mezin tê kuştin, an jî dimre. Heger birayê wî yê biçûk hebe, an jî bira tune be û pismamê biçûk hebe, divê jinik mêr neke û benda tîyê xwe yê biçûk bisekine heta ku ew mezin bibe. Heger tî an pismam 7-8 salî be, divê jinik qasê 7-8 salan din jî benda wî bisekine. Di nav Kurdan de edet e, ku bûka

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

wan ji malê dernekeve û neçe bi yekî din re nezewice.

Lê, em niha vegerin ser xwestina edetî. Di xwestina adetî de proses weha dom dike:

Heger keçik û lawik di gund de bin, berê jin di binî de, bi dizî çend caran doza xwestinê li guhên dê û bavê keçikê dixin. Riya çûna malê vedikin. .Carnan bi tenê dê û bavê lawik, an jî bi hinek kesên giregir re diçin mala bavê keçikê. Di destpêka rûniştinê de qala xwestina keçikê nakin. Qala demên berê, debar û rewşa der û dora xwe dikin, heta nîvê şevê. Êdî dem gelek derbas dibe, aliyê lawik çav ji hev re dineqînin û hêj meselê vedikin. Hingê yê ku biaxife, qirika xwe paqij dike û dest bi axaftina xwe dike. Kêm zêde bi van gotinan daxwaza xwe ji kal, bav, an jî heger kal û bavê keçikê tune bin, ji yekî wê yê pêş re dide dîyarkirin:

- Gelo hûn dizanin, em ji bo çi hatine mala we û em li ser cilka we rûniştine? Em bi emrê Xwedê û pêxember mirovatiya we dixwazin. Heger hûn layîq bibînin, em hatine keça te, ji kurê xwe re, an jî, ji kurê filan kesî re dixwazin!

Pêşî bavê keçê, bixwaze- nexwaze xwe giran dike. Ji bo nedanê ji hezar kaniyan av tîne:

- Welle, billeh ez keçê ji we re dikim gorîn! Lê, ew hîn zarok e. Nefam e. Nikare serê du mirîşkan ji hevdu derxe! Rebenê hîn ji bo nan digirî, ji diya xwe nan û av dixwaze.....

Xwazgînvanî jî, dest pê dikin:

- Na , ezbenî, keça te zêdeyê serê me ye. Xama ye, temam e. Ji vî alî ve fîrîqet be. Hema tu bêje "erê" em qebûl in.

Ha bi wî awayî, bi saetan hev dibin û tînin. Heger dilê bavê û dayînê tune be, hîç ji ya xwe danakeve.

Heta sibehê li ser wan gotinên xwe israr dike. Lê, heger ew dil hebe, qasî çend saetan paşê, mîna ku razî bibe, an jî xwe ji destên wan neqedîne:

- Baş e, de wextekî bidin me, em ê bi hev bişêwirin û paşê, em dê we agahdar bikin.

Carnan jî bavên keçan dibêjin:

- Heger hûn me layîq dibînin, min jî da xatirê we û çû. Ne keça min e, ya we ye.

Bavê lawik bi xwe, an jî nûnerê wî radibe diçe destê bavê keçikê, an jî yê ku nûnertiya wî dike. Mezin diçin rûyê hevdu û biçûk jî diçin destê mezinan. Carnan bi erêkirinê re bavê keçikê barê wan jî datîne. Ango miqtara qelend, zêr û emaretên xwe jî dîyar dike. Dema ew bar gelek giran be û li gor quweta mala lawik nebe, wekî ku hîç yek pê nehese dibêjin; "ezbenî welle ev bar giran e, em nikarin ji binî rabin" û didin rê û diçin.

Lê, li hinek herêman jî, berî çûyîna xwazgîniyê, bavê lawik bi hinek riyên badayî teqla qelendê xwe fêr dibe, hîn diçin xwazgîniyê.

Di nav Kurdan de bûyera berdêliyê jî heye. Ji ber giraniya qelend û xizaniyê, keçan bi hevdu re diguhêzin. Ji vê yekê re *berdêlî* an jî *gorîn* tê gotin. Ango keça xwe didin birayê bûkê. Carnan bav keça xwe, ji xwe re jî dike berdêlî. Di berdêliyê de herdu alî jî, ji mesrefa qelend û cihêzan difilitin. Bi tenê her kes ji bûka xwe re mesrefê dike. Di zewacên berdêlî de, dema yek jina xwe berde, yê din jî divê ya berde.

## Salixdana bûkê

Di vegerê de, ew jinên ku bi mêran re diçin xwazgîniyê, êdî dest bi salixdana bûka xwe dikin:

- Lê xwişkê qet nebêjin, me ji xwe re, wê li erdê dît! Bi Xwedê her çavek di serî de ne, reş reşşş... û wekî tas, rûyê gilor û sor-spî mîna pelekê berfa Sîpan û Xelatê! Herdu qevdên mirov li zendekê wê nayên hevdu. Bejnek li ser kerbavê ye, wekî şiva zîv-zirav. Bi serê lawê min û ne bi yê te, nava herdu milên wê, ji mîtroyek kêmtir nîne. Porên wê dirêj û reş wekî mar digehêne heta ser qorika wê. Bê nezer be, wek kara xezal e. Dema bi rê ve diçe, çirpe çirp ji lingên wê tê. Erd di bin de diheje û dilerze. Wisa jêhatî ye, ku dikare karê heft malan bi destekî rake. Bi rastî jina malan e. Tam li gor me ye. Em û ew bi tev de ketin dawa diya xwe! Lê, diya wê çîqmez û bavê wê jî kojoyek e. De ji me re çi lê, mirov keça mitribekî jî tîne!

## Belavkirina bişare

Piştî herêkirinê (qayîlbûnê), ji bo agahdariyê, berê aliyê zavê sêniya bişarê (perû, qomçe) dişeyne aliyê bûkê û ew jî bişarê (ji bo bişare loqmikên şekir çêdikin) zavê li xelkê belav dikin. Dibêjin "me keça xwe dayê kurê filan kesî." Paşê aliyê bûkê jî pişare dişênin mala zavê û ew jî  li gundî û derdora xwe belav dikin. Herweha her kes bi dozê dihese. Keçik dibe xelatkirî. Êdî ji keçikê re  xwestî û ji lawik re jî destgirtî tê gotin. Lê, li hinek herêman ji her duyan re jî xwestî dibêjin.

Di nav Kurdan de, zewaca bi mirovê xwe yê nêz re tiştekî edetî ye. Her çiqas keçik bi yekî bîyanî re bê xelatkirin jî, heger mirovê wê yê nêz, li ber rabe, pêwîst e, ku yê bîyanî xelata xwe bi paş ve bikşîne. Bi taybetî heger pismam û dotmam bin. Di nav Kurdan de gotineke weha heye: *"Pismam dikare dotmamê ji hespê peya bike."* Ango dema dotmamê bikin bûk û bibin; bi gelemperî heger pismam xwe bavêje navê; desgirtî, xelata xwe ji paş ve dikşîne û ew naxwaze serê xwe têxe doz û xaxên giran. Di nav Kurdan de evîniya pismam û dotmaman jî pir bi nav û deng e. Di vî warî de gelek serpêhatî û stran hene. Yek ji wan jî strana *Were Dotmamê* ye.

**Were dotmam**

Were dotmam xweziya mala me cîranê mala
hev bîya (2)

Hî,hîî, hîîî.....
Weylê bira şîv li malê tune bîya
Dotmam tim û tim li ba min bîya
Were dotmam de dotmam dotmam dotmam
De lê dotmam dotmam dotmam
De hê dotmam hezar car dotmam
Hî, hîî, hîîî...

Were dotmam ev çi kul e, ev çi êş e, ev çi derd e.
Hey dotmam ev çi kul e, ev çi êş e, ev çi derd e.
Ûy de tu ji xwe ra çavên xwe kilde, biskê xwe şeke,
gulîyê xwe berde
Em dê herin Xelatê, Sîpanê bibin mêvanê
Xecê û Sîyabend e.

Were dotmam dotmam dotmam
De lê dotmam dotmam dotmam
De hey dotmam hezar car dotmam
Hî, hîî.hîîî...

Ûy de dotmamê xwezî çavê min birjiya
Were dotmam wez nehatama wî alî (2)
Hî, hîî,hîîî...
Wey dê min dotmama xwe ya çavreş
Nedîta bi vî halî
De çawa sala îsalî wezê bê te xilas kim
Van cejnan vê sersalê
Were dotmam de dotmam dotmam
De lê dotmam dotmam dotmam
De hê dotmam hezar car dotmam
Hî,hîî,hîîî....

*(Ji kaseta Şivan Perwer )*

Institut kurde de Paris

## Şîranî

Piştî herêkirinê çendek paşê, aliyê lawik wext ji aliyê keçikê diwxazin û roja şîraniyê (nîşanê, şerbet vexwarinê ) dîyar dikin. Aliyê lawik û aliyê keçikê bangê kesên xwe yên nêz dikin û diçin mala bavê keçikê û şîranî dixwin.

Li gelek herêman ji şîraniyê re dibêjin nîşanî jî. Şahiyekê biçûk pêk tînin. Li hinek herêman hilbijartina birazava li vir dibe. Yek qutîyekê şekir digire û dibêje "ez birazava me." Ji vê bûyerê re

dibêjin **şekir şikandin**. Heger ji yekî bêtir kes bixwazin bibin birazava, wê çaxê, hevdu îkna dikin. Di demên berê, de şîraniya lawên mîr, axa û xanedanan carna 2-3 roj dom dikir dibû weke dîlanê. Aliyê lawik berê bi xwe re şîranî dibir, lê di van salên dawî de şekir û malzemên şerbetê dibin. Şerbetek çêdikin û pêşkêşî beşdaran dikin. Ji aliyê bûkê yek şerbetê digerîne. Ji aliyê lawik jî, yek pere davêje ser bergêşa şerbetê. Ew pere, ji wî kesê şerbetgêr re dimîne. Bi vexwarina şerbetê re, çavên xesû û xezûran ronahî û xinametiya hev pîroz dikin. Bastêx, benî, sêv ûhwd... li kesên beşdar belav dikin. Ji ber vê yekê jî, ji vê bûyerê re dibêjin **şîranî**. Gustîlkekê dikin tiliya keçikê. Qatek kinc û cotek sol jî didin wê. Li hinek herêman, di dema şîraniyê de qelend, cihêz û tiştên ku ji mala bavê lawik dixwazin jî, tên dîyarkirin. Aliyê zavê li gor wê kara xwe dike.

## Şîraniya biçûk

Li hinek dorhêlên Dîyarbekir û li Kurdistana Başûr jî li dorhêla bajarê Akrê du şîranî hene. Ji yekê re şîraniya biçûk û ji ya din re jî, şîraniya mezin dibêjin . Her du şîranî jî, bi tenê ji aliyê jinan ve tên çêkirin. Li hinek herêman, dibêjin "şîranî danîn", ne "şîranî çêkirin." Berê şîraniya biçûk datînin. Piştî şîraniyê, aliyê lawik qatek kinc û gustîlkeke din dibin û diçin mala bavê keçikê. Lê, li gelek herêmên din bi tenê şîraniyek heye. Gustîlkê dikin tiliya keçikê û şayîyeke biçûk çêdikin. Di şîraniya biçûk de, li ser şîraniya mezin jî tê axaftin. Aliyê keçikê çiqas zêr û kinc

bixwazin, divê ku aliyê lawik wan di şîraniya mezin de bîne. Ev daxwaz gelek caran sergêjî û serêşîyan derdixe holê. Dema aliyê keçikê zêde zêr û serûgo (kinc û cihêz) bixwazin, aliyê lawik dikare xwe ji paş ve jî bikşîne û dest jê berde.

Jin dixwazin di şîraniya biçûk de bûkê bibînin; ka delaliya bûka wan çawan e!? Wek kamarê çavên xwe ji ser bûkê nadin alî. Her hereketên wê kontrol dikin. Li hinek herêman şîraniyên mezin û biçûk tune ne. Herêkirin dikeve şûna wan. An jî şîraniyek heye.

## Şîraniya mezin

Şîraniya mezin wekî dawetê ye. Şayîyekê mezin e. Her du alî jî bangê mirov, nas û dostên xwe dikin. Her kesê beşdar, li gor nêzbûna lawik û keçikê û li gor quweta xwe dîyarî dikirin û tên şîraniya mezin. Wek şîraniya biçûk, ya mezin jî, li mala bavê ke çikê tê danîn û piraniya beşdaran jin in.

Keçikê dixemilînin û wê li nav odê li ser kursiyekî didin rûniştandin. Jin li dorê hole girê didin. Bi tilîlî dest bi stranan dikin. Yek ji wan stranan jî ev e:

### Lê domamê

Lê domamê naz im, naz im
Xelk xulamê naz im, naz im
Em hatine te dixwazin
Bi cotek guhar, ferek bazin
Ser nîşana te dixwazin

Lê domamê îro, îro
Dîk bangdane dîkê nîvro
Ro li me bû sed û sîh ro.

Lê domamê naz im, naz im
Xelk xulamê naz im, naz im
Em hatine te dixwazin
Bi cotek guhar,ferek bazin
Ser nîşana te dixwazin.

Lê domamê îşev, îşev
Xelk xulamê îşev, îşev
Dîk bandane dîkê nîvşev
Şev li me bû sed û sîh şev.

Lê domamê naz im, naz im
Xelk xulamê naz im, naz im
Em hatine te dixwazin.
Bi cotek guhar,ferek bazin
Ser nîşana te dixwazin.

Berî ku her kes dîyariyên xwe pêşkêş bikin, aliyê zavê ew kinc û zêr ên ku di şîraniaya biçûk de ji wan hatibûn xwestin, wan yek bi yek li navê radixin. Heger aliyê bûkê wan kêm bibînin, an jî begem nekin, pêwîst e, ku ew ji nû ve bikirin. An jî kêmasiyan temam bikin. Paşê sêniyê tînin navrastê. Dest bi vekirin û dîyarkirina dîyarîyan dikin. Pêşî ji xwişk, jinbir, jinmam, jinxal, xaltiya lawik dest pê dike û herweha ber bi nas û dostên lawik ve diçe. Yek navê wê kesê ku dîyarî aniye dibêje û paşê dîyariya wê nîşan dide. Bi dîyarkirina dîyariyan, yek bi yek hemû bi hev re tilîlî bang dikin. Bi dawî hatina



Institut kurde de Paris

aliyê lawik re, dor tê ser aliyê keçikê. Ev car bi dîyariyên dê, xwîşk û jinbirayên keçikê re dor dimeşe. Di şîraniya mezin de roja dawetê jî dîyar dikin. Di dawiya şîraniyê de hemû jin tirşik û goşt dixwin û piştre belav dibin.

Heger bûk di demeke dirêj de, bi xwestî bimîne, divê mala bavê zavê di her cejnê de, ji bûkê re dîyariyek bibin û herin cejna bûka xwe pîroz bikin.

## Qelendbirîn

Li herêmên bakurê Kurdistana Bakur, qelend (next) giran û zêde nîn e. Li herêmên başûrên Kurdistana Bakur, qelend gelek giran û zêde ye. Lê dîsan jî, ji ber barê qelend dest û dilên gelek xort û xamayên Kurd li van herêman jî, ji hevdu bûne û dibin!

Şeva qelendbirînê, alîyê lawik û yê keçikê cuda cuda bangê mele û mamosteyê gund, mirov, dost û kesên hêja û rêzdar dikin. Her du alî jî, ji xwe re nûner hildibjêrin. Gelek caran bavê lawik û keçikê deng nakin û nûnerên wan dipeyîvin. Berê aliyê keçikê ji nûnerê xwe re dibêje û divê ji wê deraxê danekeve jêr. Ango jê re sînorê xwe danîye. Nûnerê alîyê lawik jî, dizane heta çiqas dikare ji bin bar derkeve. Ji wê şûn ve heger bar giran be, êdî divê bazarîyê neke.

Ev jî wek şeva xwazgîniyê, civat berê ji xwe re sohbet dike heta demeke û paşê nûnerê aliyê lawik



Institut Kurde de Paris

dest pê dike û doza qelend vedike:

- Gelî civatê, ma ne bes e? Divê em vegerin ser karê xwe, na?

Hemû bê deng dibin û pê re çend kes dibêjin

- Belê, de kerem bikin!

Nûner gotina xwe didomîne:

- Divê evcar ciwamêr barê me, li me bikin! Ka em binêrin barê me çiqas e? Kî kerem dike?

Nûnerê aliyê keçikê qirika xwe çêdike û:

- Belê, kerem bikin!

- Kerem jî ya we ye û gotin jî ya we ye! Tu kerem bike!

Êdî çav û guhên her kesî li ser nûnerê aliyê keçikê ye. Gelek caran jin jî, di dema xwazgînî û qelendbirînê de, li pişt derî û perdan guhdarî û temaşe li mêran dikin. Kesê nûner dest pê dike:

- Qelendê me ........ e. Nîvê wê, min da ji bo xatirê Xwedê û pêxember aleyweselam! Min hewqas hezar da xatirê civata hazir. Hewqas jî da xatirê seydayê me. Hewqas jî, min da xatirê malim efendî. Ma çiqas, de hûn êdî hesab bikin?! Ji derê wê, hûn dê ji birayê keçikê re çardehxwarek (debanca ku 14 derb digire) û ji xalê wê re jî tifingeke nêçîrê ya dulûle bikirin.

Di hinek herêman de, di şûna pere de, pez jî dixwazin.

Axîn û waxênek bi aliyê lawik dikeve:

- Malbav ava, ma te barek li me kir, ku qudim nema ku em di binî de rabin lo! Te mala me şewitand! Ev çawa xinametî ye? Xwedê xêrê bide te û heftsed bavê te! Li gor me bar li me bike!.. Ma tu nizanî ku em gelek qels in?

- Ma ev jî bar e, malneketno? Di vê dema han de qîmeta pere û mal maye?

Nûnerê aliyê lawik:



INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE •

- Na, ez bi qurban... li gor quweta me bar li me bike, ku em bikaribin ji bin rabin. Ka carek tu dev ji wê çardehxwar û tifingê berde. Û yê din jî li gor me kirasek bifesilîne û li me bike!

Herweha di dawiya bi serhev û berhevdanên gelek zor û dirêj de, heta berbanga sibehê qelend kêm dikin. Li cihekî girê didin. Dema bigîhên encameke û girêbidin; nûnerê aliyê lawik radibe diçe bi destê nûnerê din digire. Paşê destê bav û mirovên keçikê jî digirin û spasdariya xwe pêşkêş dikin. Civat her du aliyan jî pîroz dike. Di dema rabûnê de pereyên xwe dikin bin doşekê. Û heger kêm be jî, dibêjin "yên din jî, em dê paşê bînin." Radibin, xatir dixwazin û diçin. Carnan di şeveke de qelend nayê girêdan, bi paş ve davêjin.

Li herêmên bakurê Kurdistanê, qelend gelek giran e. Bi taybetî li herêmên Mêrdîn, Riha, Dîyarbekir û Kurdistana İraqê û Suriyê... Hema hema keçikê davêjin ber zêr û peran... Qasî giraniya keçikê zêr û pere dixwazin. Li van herêman carnan, di şûna pere de bi sedan pez û dewar jî didin. Strana Cembelîyê Mîrê Hekarîyê, di vê babetê de mînakekî berbiçav e, ku keçikê çawan bi kerî û colên pez dane.

Di van cihan de, piştî dîyarbûna qelend, bavê lawik gaziyê mirov û dostên xwe dike. Ji wan re xwarineke çêdike. Paşê gawendiyek (mitribek) an jî, ji aliyê lawik yek sîniya çayê digire û li ber her kesê beşdar digerîne. Ew jî, yeko yeko pere davêjin ser sîniyê. Ev pere ji bo qelenddayînê berhev dibe û alîkariyeke civakî ye.

Di nav Kurdan de, ji ber qelenddayinê ve 7 sal şivanî û gavanîkirina mala bavê keçikê jî heye. Dema bav keça xwe herê bike û qelend tune be, divê zava 7 sal ji mala xwezûr re şivanî û gavaniyê bike û piştî 7 salan, dê ew keça xwe bide pê. Ev edetekî gelek kevin e. Îro mirov ancax di stranan de dikare bibîhse. Di rewşên weha de zavê diçe ser mala xezûr. Ango dema dizewice jî, di mala xezûr de dimîne. Ji derê rewşên weha jî, carnan hinek kes diçin ser mala xezûr. Çûndina ser mala xezûr li hinek cîhan hem ji bo zavê û hem jî, ji bo xezûr gelek şerm û kêmasî tê dîtin.

Xweza niha li Kurdistanê rewş û edetên kevin hatine guhartin. Li bajar û bajarokan keç û law bi dilê xwe hev divên. Qelend jî, ji navê rabûye. Di nav gel de stendina qelend, bûye tiştekî şerm û biçûkdîtin.

Institut kurde de Paris

# Karûbarên serûgo

Bi nêzbûna roja dawetê re, her du alî ji heziriya dawetê dikin û tiştên pêwîst dikirin. Li hinek herêman ji vê yekê re dibêjin "karûbarên serûgo" û hinek jî dibêjin "karûbarê cihêz." Aliyê lawik ji zava û bûkê re kinc û tiştên dawetê dikirin. Û kara xwe ya xwarin û vexwarina dawetê dikin.

Aliyê bûkê jî, dest bi kirîn û berhevkirina cihêzên bûkê dikin. Dê, xwişk, bûk û kesên nêzî keçikê dest bi çêkirina destik, destmal, gore, bersing, pêştemal û hwd. dikin. Hinek dê, hîn keça wê 8-10 salî ye, dest bi çêkirin û bervhevkirina cihêzên wê dikin. Heta keça wê tê mêran, êdî cihêzên wê gelek digehêne hevdu.

Di van salên dawî de êdî cihêzên bûkê piranî bi destan çênakin. Yên çêkirî ji çarşiyê dikirin. Ev car dora mala bavê bûkê ye, ku ji keça xwe re cihêz bidin çêkirin û mesrefê bikin. Ji ber ku wan êdî qelend û dîyariyên xwe girtine. Vê carê, dora wan û mesrefê ye. Li bajaran, divê ku mala bavê bûkê, mala keça xwe bi tevayî raxin. Ji karyolê heta nivîn û hûr û mûrên malê hemû dikirin. Roja dawetê, êdî mala bûk û zavê bi awakî raxistî amade ye.

Bûka ku bê cihêz û bê serûgo be, bê qîmet e. Her kes piştî dawet û sêrojê henek û tinazên xwe pê dike. Mala bavê lawik heta roja mirinê ji bûkê re dikin serhevde û didine rûyê wê. Bi taybetî heger jintîyên bûkê hebin; dibêjin:

"Bavê te, ku çiqas qelend ji me girt, lê, du cot gore û du serî sabûn ji te re dananî! Te tazî bi rê kir. Ne tu keça wê malê yî."

Bi wan tahn û niçan, bûk li hember mala xezûrê



Institut kurde de Paris

xwe şermezar dimîne. Li ser cihêzên bûkê di şîraniyê û dawetê de stran jî tên gotin. Yek ji wan weha ye:

**Ax lê hevalê**

Ax lê lê lê hevalê
Ax lê lê lê hevalê
Bûk stûna nava malê
Ax lê lê lê hevalê
Ax lê lê lê hevalê
Keçê sorê çav xezalê
Bûkê rabe rabe ser xwe
Daykê rabe rabe ser xwe
Bûkê megrî, megrî
Daykê megrî, megrî
Hêstrên gilor mede alî
Hemû çûne bi vî halî
Bûkê rabe rabe ser xwe
Daykê rabe rabe ser xwe
Sor sindoqê bikşîn ber xwe
Sor sindoqê bikşîn ber xwe
Derxe qata cilê tîyan
Derxe qata cilê tîyan
Bide nav çavên jintiyan
Ax lê lê lê hevalê
Ax lê lê lê hevalê
Bûk stûna nava malê.

*( Ji herêma Licê )*

Institut kurde de Paris

# Gazîkirina dawetê

Di nav Kurdên misilman de çend car jinanîn edeteke edetî ye. Lê, ew bi gelemperî ji bo cara pêşî dawetê çêdikin. Kêm kes dema jina didu û ya sisêyan bîne dawetê çêdike. Ji bo jina jinebî û mêrê bî jî, kêm caran dawetê çêdikin.

Hefteyek berî dawetê, zava û birazava - li hinek herêman birazava bi tenê - mal bi mal digerin û wan vedixînin dawetê. Lê, di van salên dawî de, zava û birazava gazî xelkê nakin; ji mala zavê yek, vî karî dike, ango malbatan vedixwîne dawetê.

Li navça bajarê Siwêrekê û li hinek cihên din jî, aliyê zavê ji bo vexwendina dawetê, wezîfe didine pîrejika xizan, an jî jinebiyek. Xwediyê dawetê heqîba (xirceka) pîrejinê tijî dîyarî dikin. Li hinek herêman ji van dîyariyên vexwendina dawetê re dibêjin qomçe (xwençe) û hinek jî dibêjin bişare. Ew heqîbeke tijî bişare dikin û pîrejin, mal bi mal digere û gaziyê wan yê dawetê dike. Li gor rêzgirtina (qîmeta) malbatan ew dîyariyên ku di heqîbê de hene, yek ji wan dide malbatên vexwendî. Li herêma Siwêrekê piraniya van dîyariyên vexwendina dawetê, topên qumaş in. Malbatên vexwendî jî, pere an tiştekî din didin pîrejinê û her malbat perçek şîfon(qumaş) jê dike û bi milê pîrejinê ve girê dide. Her ku diçe mil û bejna pîrejinê ji şîfonên rengîn dixemile. Li gor perçeyên şîfonan, ew kesên ku pîrejinê dibînin, dizanin ku wê gazî çend malbatan kirîye. Pê derdixin ku dawet mezin e, an biçûk e.

Niha li bajar û bajarokan gazîkirina dawetê bi hinartina kart û telefonan jî dikin.

Institut kurde de Paris

## Dawet

Bi gelemperî dawetên Kurdan di payîzan de tên çêkirin. Di bihar û zivistan de jî çêdibin, lê kêm in. Ji ber ku payîzan her kesî teneyê (zimhêrê) xwe yê salewextî dihewîne, rez û bexçeyên xwe hiltîne û tedareka xwe ya zivistanê dike. Êdî dema vêsanê (isirhetê) ye. Daweta Kurdan a edetî sê roj e. Carnan hefteyekê jî dom dike. Yên dewlemend ji zarokên xwe re hefteyeke dawet dikin. Wekî mîr, axa û serokeşîr... Di çîrokên kurdî de, dawetên Kurdan 40 roj û 40 şev dom dikin.

Dawet li baniyê mala zavê bi dîlokan dest pê dike. Ji wan dîlokan yek jê weha ye:

Dê bikine toz
Dê bikine toz
Derxaniyê zavê bikine toz
Ew zavayê bûk lê pîroz
Derxaniyê zavê bikine toz...

(.....)

*(Ji herêma Badînan, ji berhevokên M. Mayî )*

Institut kurde de Paris

Li Kurdistana Bakur jî gelek caran bi vê strana jêrîn dest bi dawetê dikin:

### Lê bi govendê

Lê bi govendê, lê bi govendê
Lê bi govendê xweş lewendê
Min heyrana gula zendê
Wez ji kerba te hatime bendê

Lê bi govenda sorgulî
Xweş govenda bi sorgilî
Keske sor û zer xemilî
Sergovengêr da milmilî
Bingovengêr da milmilî
Lê bi govendê, lê govendê
Lê bi govendê xweş lewendê.

İro li gundê me dawet e
Sebrê warê me dawet e
Govend gerya xet bi xet e
Dîlan girtin xet bi xet e
sergovendê girtî met e
Bingovendê qîz û met e
Lê bi govendê, lê bi govendê
Lê bi govendê xweş lewendê.

Lê bi govenda devê sûkê
Xweş lewenda devê sûkê
Def û zirne li ber şimûkê
Dîlan gerya ber şimûkê
Ew daweta zava û bûkê
Ew pîroz be li zava û bûkê
Lê bi govendê, lê bi govendê
Lê bi govendê, xweş lewendê.

( Ji kaseta Şemdîn-1 )

Li ser baniyê zavê, *darika zavê* dadiçkînin. Kincên sor, zer û kesk bi darika zavê ve dikin. Her kes ji dûr ve darika zavê dibîne û mala dîlanê dinase. Lê, li hinek herêman darika zavê di roja bûkanînê de, li ser xaniyê zavê dadiçkînin. Bi darika zavê ve sêv, porteqal û şiranî jî girêdidin. Li hinek herêman ji

dîkekî serjê dikin û bi darika zavê ve dadileqînin. Dema darika zavê dadiçkînin, çend kes vê strana han distrin:

Heyla darê
Heyla darê
Gulî xwarê
Emê kî û kî bi zava kin
Emê kekê min bi zava kin
Emê cil li bejnê kin
Emê kolos li serî din
Emê cîzme li nigan kin
Emê Saet li desta kin
Gustîlk li tilyan kin
Li nav koma mirovan kin
Emê wişkê bi qurban kin.
Heyla darê
Heyla darê
Gulî xwarê
Darika zavê kesk û şîn e
Guliya navê heft rengîn e
Ew kî were biqetîne
Berbûkî tê û diqetîne
Zavê sêveke diweşîne
Şarika bûkê diqetîne.

*( Ji herêma Xerzan, ji devê Ş. Baksî )*

Di nav Kurdan de darika zavê girîng e. Dema nifir li xortekî tê kirin, dibêjin; "*hêy lawo tu darika zavatiyê nebînî!*"

Dema dîlan piçek xweş û germ dibe, govendê dikşînin rasta gund, an jî ser bêderan. Dengê def û zirnê bi ser gund ve digire. Bi sariya sibehê û

hênikayiya êvarê re, deng digehe gundên derdorê.

Her roj di berbanga sibehê de, zirnevan û dawilvan hildikşin ser kaşê gund, ger gund li cihekî rast be û kaş û banî tune bin, wê çaxê derdikevin ser baniyê xaniyekî du tebeq û zirnevan qasî nîv saetî meqamê sarî û serhawayî lê dixe. Paşê bi dawilê re, eynî meqam didomînin. Gundiyan hişyar dikin û gaziya govendê dikin.

Kesên ku ji gund, an jî, ji gundên din têne dawetê, kincên xwe yên herî xweş li xwe dikin, çekên (sîlehên) xwe yên herî baş girêdidin û bi dîyariyên xwe ve tên dawetê. Hinek bi xwe re pez tînin. Hinek jî, bi sawar, bi tûrên şekir û birincê ve tên dawetê. Dema nêzîkî li gund dikin, şeşderb, an jî tifingên xwe dertînin û diteqînin, wan ji hatina xwe agahdar dikin, dîlan û şahiyê pîroz dikin. Yên li dawetê jî, bi çek bersiva wan didin. Bi teqandina çekên xwe dibêjin; " *hûn bi xêr hatin, bi ser ser û ser çavan re.*" Xwediyê dawetê pêrgê wan diçe, bixêrhatin dide wan û dîyariyên ku bi xwe re anîne, ji wan digire. Li hinek cîhan, dawilvan û zirnevan jî, pêrgê wan diçin û wan şabaş dikin.

Gundî ew kesên ku ji gundên der- dorê tên, wan di nav xwe de, ji bo mêvanitiyê li hevdu parve dikin. Heta dawiya dawetê ew mêvanên wan in. Dema xwarin, vexwarin û razanê her gundiyek mêvanê xwe dibe mala xwe. bi wî awayî, barê xwediyê dawetê jî, sivik dibe.

Dawetên Kurdan, bi tenê ne govend û şahî ne; ji dawetê bêtir dibe wek festivalekê. Dibe qada hemberî (pêşbirik) û şahiyên tevî. Dema govend geş û xweş dibe, koçek û govendgêr - li herêma Licê ji

govengêr re, çengçî jî dibêjin - derdikevin mey dana hemberiyê. Hemberiya ka kî bêtir xweş govendê digre û digêrîne. Kesên govendgêr û koçek, yeko yeko li ber defê diçin û tên. govendgêr bi dor cîhên xwe diguhrînin. Ji serê govendê diçin dawî û ji dawî diçin serî. Ji serî heta lingan xwe wekî tûra nav avê dilerizin û direqisin. Jin û mêr li der - dora wan rêz dibin. Ji wan re çepik lê dixin. Bi saetan govend weha dom dike. Xweydan di ber lingên wan re davêje û ji eniya wan diniqute. Bi destmalan xwêdana xwe paqij dikin.



*Li Xerzan dawetek*

Li gundan jin û mêr dikevin destên hevdu û bi hev re govendê digirin û distrin. Lê mixabin, li bajar û bajarokan tesîra ola Islamê bêtir e, daweta jin û mêran cuda ne. Dîsan ji ber tesîra ola îslamê, li hinek herêman dawil û zirne heram tê dîtin û di dawetan

de lêdana wan qedexe ye. Di şûna dawil û zirnê de teplik, erebane, bilûr an jî bi tenê stranan dibêjin û li ber govendê digrin. Carnan li tekekeyê jî dixin. Li herêmên weha xweza stranên govengê gelek bi pêşketine.

Niha li bajaran, êdî Kurd dawetên modern çêdikin. Ev dawet ji edetên Kurdan gelekî dûr in, nêzî dawetên Ewropayiyan in.

Edetekî Kurdan jî ev e, ku dema keç û law di gundekî, an jî di taxeke de bin, aliyê keçikê nayêne dawetê; bên jî, ji bo wan şerm e, ku kêf û şahiyê bikin û tevê govendê bibin.

Li aliyê bûkê jî, bi tenê jin dawetê dikin. Li hinek herêman, birayê zavê bi tenê dikare here nav jinan û bi wan re govendê bigre. Wê çaxê, pêwîst e, ku birayê zavê, bûkê rake govend û reqsê.

Li bajarên rojavayên Kurdistana Bakur, di rojên dawî yên dawetan de, zave û hevalên xwe vedixwin û bi tembûr û stran li nav bajêr, tax bi tax digerin. Herweha zave heval û nasên xwe dibîne û ew jî zavê pîroz dikin.

## Lîstikên li der

Kurd di dawetan de, li der lîstikên şanogêrî çêdikin. Bi rastî di wan şanogeriyan de, gelek huner hene. Piraniya mijarên wan şanogeriyan li ser rewşa civakî û sîyasî ne. Ez ji wan şanogeran çend li jêr pêşkêş dikim.



Institut Kurde de Paris

## Şûr û mertal

Lîstika şûr û mertal, lîsikeke şer e. Ya şerê berê yê dema şûr û mertal e. Govendgêr di nav xwe de du komik (grûb) çêdikin. Her komek ji 9-10 kesan pêk tê û herdu komik li hember hevdu radiwestin. Her kes bi destekî bi pişta yê pêşiya xwe digire û wek hebên tesbîhê li dûv hev rêz dibin. Yên serê lîstikê di destê wan yê rastê de şivek û di destê wan yê çepê de jî ferek sol hene. Şiv şûr û sol jî mertal e. Dawil û zirne bi meqamê şerê dest pê dikin. Herdu rêz li hember hevdu dest bi şer dikin. Herdu yên serî qumandar in û yên li pişt van jî leşkerên wan in. Qumandar bi şiva xwe, leşkerên xwe dike rêzê û li wan xwedî derdikeve. Û piştre bi tempoya dawil û zirneyê êrîş dibin ser hevdu. Leşker ji ber ku derb nexwin û kumên wan nekevin, dema şiv radibin, ew hol dibin û xwe ji ber şivan didin alî. Bi şertek ku destên xwe ji pişta hevdu bernedin. Dema destê yekî ji pişta yê pêş wî biqete, divê bi lez û bez dîsan xwe bigihîne wî û bi pişata wî bigire. Di navê de dawil û zirne radiwestin û vê carê ew dest bi strana *Qaqibo* dikin. Qaqibo bi zarê kewan e. Dema kew li şer sor dibin dibe qibe qiba wan:

Qaqibo, qibo qibo
Qaqibo xweş qaqibo
Qaqibo qibê te me.
Li nav rezê xalê te me
Li ber pozê apê te me
Deqê te û bavê te me.
Qaqibo, qibo qibo
Qaqibo xweş qaqibo
Qaqibo qibê te me.

Institut kurde de Paris

Li nav erdê kalê te me
Dijminê bavê te me
Deqê te û apê te me.
Qaqibo, qibo qibo
Qaqibo xweş qaqibo
Qaqibo qibê te me.

*( Ji herêma Dîyarbekirê )*

Piştre dawil û zirne ji devê wan digirin. Ew êrîş dibin ser hevdu. Hem bi şivan li yên koma din dixin û hem jî dema fersend bibînin kumên wan ji serên wan dixin erdê. Kuma kî ji serê wî bikeve, divê ew ji lîstikê derbikeve der. Kîjan kom bêtir kumên yên din bixin, ew kom qezenc dike.

Institut kurde de Paris

**Bûkrevandin**

Kincên jinan li peyayekî (mêrekî) dikin û wî dikin mîna bûkekê. Serûçav, dest û lingên du kesan jî tenî dikin. Ew dibin wek reşikên Afrikayê. Ji wan reşikan re dibêjin *qirdik*. Licî jî, ji qirdik re dibêjin *kose*. Di destê her qirdikekî de kamçiyek heye. Bûkê bi qirdikan re dikin govendê. Govend geş dibe. Qirdik bilî govendê dibin. Yek, bûkê ji govendê digire û direvîne, dibe maleke. Bîstek paşê qirdik, li xwe hay dibin, ku bûk tune. Ew dîn û har dibin. Bi kamçiyên xwe, bi der û dorê dikevin. Kîjan mêr rastê wan bê, li nav guhên wî bar dikin (lê didin). Her kes ji harbûna qirdikan direve. Qirdik didin du xelkê. Ew, bi taybetî li mirovên zavê digerin û li wan dixin û

dixwazin ku cihê bûkê fêr bibin. Li nav gund li qavzê digerin. Gund dibe wek qada şer. Zarok li dûv qirdikan mal bi mal, kûçe bi kûçe (kolan bi kolan) digerin.

Heger mirovên zavê berî destpêkirina listikê, ji lîstikê agahdar bin, ji gund direvin der û xwe vedişêrin, heta ku lîstik teva bibe. Di dawî de, qirdik li çend kesan didin û ew jî, ji tirsan cihê bûkê dibêjin. Ew diçin bûkê tînin û dîsan dikevin govendê. Piştre govend dîsan geş dibe. Dema ku yek dest bavêje bûkê, qirdik bi qamçiyan êrîşên wî dikin û ew kes ji meydana govendê dipeke der.

## Mehkema Tirkan

Yek dibe axayê gund. Çend kesên din jî dibin gundiyên li dij axê. Bi taybetî û zanebûn ew kesên mirovên zavê dikin rola gundiyan. Ji ber ku dê paşê ew derb û kotekan bixwin. Yek dibe çawîş û çend kes jî dibin leşkerên Tirk. Cilên leşkerên Tirk li xwe dikin û tifeng li milên wan in. Gundî zerarê didin malê axê. Axa diçe qereqolê ba çawîş û gilîyên wan ji çawiş re dike. Çawiş û cendirme tên û gundiyan digirin. Dest û lingên wan girêdidin. Bi tirkî ji wan dipirsin:

"Çima we zerara axê kiriye?"

Gundî "şildim bildim" dikin, lê bi tirkî nizanin. Çawiş emir dide, da ku cendirme li gundiyan bixin. Paşê wan dibin mehkemê. Yek dibe danêr (hakim) û yek jî dibe dadist (sawcî). Gundiyan li gor qanûna Tirkan mehkeme dikin. Dadist û danêr dest pê dikin û ceza ji wan re dixwazin:

- Li gor qûnûna me ya se û rovî, qûça 8, bend û

newala 126 î, divê mehkeme we 15 sal ceza bike.

Gundî dest bi lavan dikin:

- Hakim Beg, welle min tiştek bi se û rovî nekiriye. Min qûç xirav nekiriye û neketime bend û newalên tû kesî. Heger ben yaptî ikî gozun kor olsin.

Ji ber ku baş bi tirkî nizane, dixwaze bêje heger min kiri be herdu çavên min kor bin, lê di şûna wê de dibêje, "heger min kiri be herdu çavên te kor bin." Danêr û dadist, ji wan gotinên gundiyan gelekî eciz dibin. Danêr bi ser eskeran ve diqîre:

- Dest û lingên wî girêdin. Bavêjin erdê û lêdin heta av di bin zikê vî kerî han re bibore!

Cendirme jî, li gundiyan dixin.

Cendirme dest û lingên gundiyan girêdidin û ew dawêjin erdê. lingên wan dixin feleqê û li bin lingên wan didin. Gundî di destê wan de hewar hewar dikin û dîsa:

- Hakim Beg, hakim Beg... welle min tiştekî bi seyî nekiriye, qûçan xerav nekiriye û min xwe di newalan de veneşartiye lo!....

**Nîşandarî**

Di dawetan de nîşandanîn û girtin karekî edetî ye. Ji destpêkê heta dawî, ew karê hemberiyê dom dike. Li perê gund, bi kevirekî nişangehek dadiçkînin. Xwediyê tifingan çok didin erdê û berik davêjin nîşangehê. Her ku lê sor dibin, di carekî de, rextên xwe vala dikin. Bi wî awayî teqîn û reqîn bi ser gund

dikeve. Dengê tifîngan bi ser dengê zirne û dawilê dikeve.. Wey li wî peyayî ku li nîşangehê bixe. Yê ku lê bide, heta daweteke din, di herêmê de nav û deng dide. Li aliyê din, ev car bi şeşderban bera nîşanê didin. Dengê şeşderb, tifing û yên zirne û dawile dikevin nav hevdu. Gelek caran derb ji dest dertên. Kuştin û birîndarî çêdibin. Di qewmandina qezayên weha de, dawet nayê rawestandin û dom dike, piştî anîna bûkê, vê carê şîn dest pê dike.

Li ser mêrg û bêderan kevirê hêzbûnê davêjin. Kî dûr bavêje, ew dibe xurt û hêzdarê dawetê. Peya kom dibin û sêkevir (qaziyan) dilîzin. Bi listikên curbe cur pêşbirik dom dikin.

### Beza hespan

Piraniya wan kesên ku ji gundên derdorê tên, siwarî ne. Heger hespên wan tune bin jî, yên mirov û dostên xwe bi emanetî digirin û tên. Ev yek, ji bo çek û kincan jî derbas dibe. Hema hema di her dawetê de hespan jî dibezînin. Di nav Kurdan de meqamê hespbezînê heye. Dawil û zirne meqamê cirîdê lêdixin. Dibe hîre hîra hespan, mîna ku şer dest pê bike. Xwediyê hespan, hespên xwe ji tewlan dikşînin û ji gund dûr dikevin. Qasî 5-10 kilometreyî ji gund dûr diçin û ji wir, ber bi gund ve dibezînin. Dawetvanî jî derdikevin ser cihên bilind û li wan temaşe dikin. Yê ku ji hevdu derbas dibin, kuma yê li pêş xwe, ji serî digire û ber bi gund ve direvîne. Yên



*Li Kurdistana Bakur sê cirîtvan pêşbirikê dikin.*

din jî didin dûv. Beza hespan heta gund dom dike. Siwariyên jêhatî li ser pişta hespê hereketên akrobîk dikin. Xwe di bin sing û stuyê hespê de dizivrînin. Ji ser pişta hespê xwe davêjin erdê û li ser lingan radiwestin... Di dema bûkanînê de jî, xwendî hespan wilo dibezînin û kumên hevdu direvînin.

# Lîstikên li hundir

## Aş û qeraş

Dema zivistan be, an jî hewa sar be, li hundir jî gelekî lîstik çêdikin. Wek lîstika aşê. Dema di salonê de civat geş dibe; yek derdikeve û dibêje:

- Arvanê min qedîya ye. Ez diçim aşê.

Du kes ji xwe re dike tayê genim. Ev car li kerekî digere, ku genimê xwe pê bibe êş. Ji mirovê zavê (li hinek cîyan zavê bi xwe) yekî ciwan di çavên xwe de diborîne û ber pê diçe:

- Haaa, ev kerekî baş e. Mîrat pir bi hêz e jî. Û pê digire û dikşîne navrastê. Li hinek cihan zavê dikin kerê aşê. Heger zavê kerê aşê be, wê hingê tûrekî tije ka û ceh dikin û di nav civatê de dixin serê zavê. Her kes dikene û diqîre:

- Belê, wele ew kerekî gelek bi hêz û qelew e.

Her du çewalên (du peyan) xwe li kerê dike û bi pînan li qûna wî dixe. Wî ji quncikekî dibe quncika din. Ew quncik aş e. Lê, dergehê aşê venabe. Ji bo vekirinê dest davêje darê xwe û her kes direve. Yê ku bêgirtin, bi dar lê dide. Barê xwe vedike û her yekê bi cihekî ve davêje. Lê, mêze dike, ku cuya aşê xetimîye û av naye ser êş. Dest davêje bêrê û di nav odê de digere. Bi bêrê li lingên kesên ku di odê de ne dixe. Her kes lingê xwe dikşîne û direve. Ew diqîre:

- Kîjan kerbavî ev cuya xetimandîye. Heger ez wî bigirim, ez dê wî post û zol bikim.

Cu çêdike û avê lê rast dike. Ev car diz dikeve êş û kevirên wê dibe.. Jê re kevir pêwîst e. Çavên xwe li keviran digerîne. Li mirovên zavê digere. Hinek mirovên zavê, bi tilîyan nîşan didin. Ew du mirovên

zavê digire û dikişîne rastê û dibêje:

- Waxxxx, waxx, ka binêrin kevirên aşê yên weha li kû hene! Mermer in, mermer!...

Bi qayiş dest û lingên wan girêdide. Gaziyê qeraş dike:

- Qeraş qardaş were! her tişt hazir e. Barê min bihêre...

Qeraş bi 4 kesên din ve tên. Du kes radihên çawalan û diduyên din jî, her yekê radihê kevirekî û wan li ser piştê dizivrînin. Di destê xwediyê arvan de kundirê avê û di destê qeraş de jî, tûrê ard heye. Yek ard û yê din jî avê li serê wan dikin.

## Pêşbirika dengbêjan

Êvaran dema dibe derengî, xelk ji govend û lîstikan têr dibe, ev car dor tê ser dengbêjan. Dengbêj dema nûçeya daweteke dibîhîsin ji gelek gund û herêmên cuda û dûr tên dawetê. Her kes li odê, li cîhê xwe rûdine û li benda dengbêjan dimîne. Destpêkirin ne hêsan e. Her dengbêj xwe giran dike û dibêje; "na welle ez nizanim", an jî "dengê min ketiye, qirika min dêşe..."

Piştî demeke yek hema tiliya xwe dibe binê guhê xwe û straneke kin distre. Piştre bi tiliya xwe yekî ji dengbêjan şan dide û dibêje; "min avêt ser filan kesî" û navê wî dengbêjî hildide.

Êdî dibe qibe qiba dengbêjan. Ew kesê ku hinek berê digotin; " welle ez nizanim," an jî "qirika min dêşe," ev car dor nade kesekî din. Hîn yek strana xwe tewa nake, yê din ji devê wî digire û dom dike.

Dema dilorînin her kes ji wan re "tew" dike. Wê çaxê dibe vingên û gumêna odê. Heta sariya sibê, Dengên dengbêj, dîk û keran dikeve nav hevdu.

Êdî heta daweteke din gundî, an jî ew xelkê herêmê behs û pesnê dengêjan didin. Her yek, li gor xwe yekî mezin û hunermend dibîne.

Di van salên dawî de, dema teyip derketin, vê carê di hemberiya dawetan de, dengê dengbêjan digirin kasetan û paşê êvaran di civatan de guhdarî dikin û her kes şirova xwe li ser deng û hunerên wan dike.

Li hinek gundan, dema her kes biliyê dengbêj û lîstikan dibe; hinek xort dikevin nav pezên mala bavê zavê û ji wan yek- dido didizin. Dibin serjê dikin û dixwin.

Li hinek herêmên Kurdistana Suriyê jî, heta ku dîlan dom dike, zave paşayê gund e. Ew çi bêje gundî nikarin ji gotin û fermana wî derkevin der. Zave, ezepçêriyên xwe dişîne mala hinekan û doza pezek an tiştekî din li wan dike. Heger xwediyê malê emrê paşê (zavê) bi cih neyîne, ezebçêrî herdu destên wî girêdidin û wî tînin huzûra paşê. Zave ji roja destpêka dawetê heta roja bûkanînê paşayê gund, an jî yê taxê ye. Di vî warî de çîrokeke weha heye:
Rojek yekî xizan û belengaz dibe zava. Ew ezebçêriyên xwe dişeyne mala mîrê herêmê. Ezebçêriyên wî zordestiyê li mîr dikin. Mîr gelek diqehere, lê nikare tiştek ji ezebçêriyan re bêje. ezebçêr çend heywanên mîr jî digirin û diçin. Çend meh di ser daweta wî de derbas dibe; rojek zavê di rê de rastê mîr tê. Mîr çawan çav pê dixe, hema deng li peyayên xwe dike ku wê bigirin û mîr tola



INSTITUT KURDE DE PARIS BIBLIOTHÈQUE

xwe jê bistîne. Peyayên mîr, ji mîr re dibêjin:

- Mîrê me, em xulam, ew nemêr e û hîn jî nezewiciye. Ango hîn jî ew paşa ye!

## Traşa zavê

Roja didu an sisêyê dawetê, birazavê diçe berberekî tine. Berber por û riyê zavê kurdike. Heger hewa xweş be, li ser baniyê mala zavê kursî datînin û zavê li ser rûdine û berber dest bi kurkirina rû û porê wî dike. Dawil û zirne radiwestin. Li der dora zavê helqe digerînin û dest bi stranan dikin. Ji wan stranan yek jî ev e:

### Ax lo zava

Ax lo zava zava zava
Lo lo  lawîn zava,
Ax lo zava zava zava
Lawik mala te ava....
Ev zavakê di mala me da
Lo lo lawîn zava
Ev paşakê di mala me da
Kekê min î (ê) paşa..
Dest û nigên wî di hene de
Lo lo lawîn zava
Dest û nigên wî di hene de
Lawik mala te ava.
Ev zavakê li serê banî
Lo lo lawîn zava
Ev paşakê li serê banî



Institut kurde de Paris

Kekê min î paşa
Pişt xulxulî kete zendê
Lo lo lawîn zava
Pişt xulxulî kete zendê
Kekê min î paşa
Şêla wî şêla govendê
Lo lo lawîn zava
Şêla wî şêla govendê
Kekê min î paşa
Kirasê zavê ji pelka guzê
Lo lo lawîn zava
Kirasê paşê ji pelka guzê
Lawik mala te ava.
Me fesiland par temûzê
Lo lo lawîn zava
Me fesiland bi dembûzê
Lawik mala te ava.
Lo lo zava zava zava
Lo lo lawîn zava
Lo lo zava zava zava
Lawik mala te ava.

Sadilkêfê, Enqerîsê *
Lo lo lawîn zava
Sadilkêfê û Enqerîsê
Kekê min î paşa
Ev qaşila ser beysûsê
Lo lo lawîn zava
Ev qaşila ser beysûsê
Kekê min î paşa
Kirasê zavê ji pelka sûsê
Lo lo lawîn zava
Kirasê zavê ji pelka sûsê
Kekê min î paşa

Lo lo zava zava zava
Lo lo lawîn zava
Lo lo zava zava zava
Lawik mal te ava
Kirasê zava ji pelê darê
Lo lo lawîn zava
Kirasê paşê ji pelkê darê
Kekê min î paşa
Min fesiland par biwarê
Lo lo lawîn zava
Min fesilann par biwarê
Kekê min î paşa
Heft bimbarek li canê yarê
Lo lo lawîn zava
Heft bimbarek li canê yarê
Kekê min î paşa.

*( Ji devê Fatima Dîyarbekirî )*

Institut kurde de Paris




Dema dawiya traşê tê, berber bi "tilîlî" zavê pîroz dike. Devê şûşa lewantê bi tevayî vedike û pêşî li serê zavê dike; paşê vedigere der-dora xwe û şûşa lewantê li wan direşîne. Bi berber re hemû tilîlî dikin. Birazava destê xwe dixe berîka xwe û heqê berber dide. Ji xwe birazava di binê barê herî mezin û giran de ye. Giraniya xerc û lêçûna dawetê li ser wî û malbata wî ye. Birazava, mirovê zavê yê nêz e, an jî dostekî wî yê herî pêş e.

## Şeva desthene û serheneyê

Şeva dawî ya dawetê, şeva henê û ya serhene ye. Li aliyê zavê di derengiya şevê de, êdî dest bi henekirina zavê dikin. Di bergeşeke mezin de hene çêdikin û di nav de çend mûman dadiçikînin. Li nav malê kursîyekî xemilandî datînin û zave li ser rûdine û nazbalîfekî didine piştê. Helqe li dor zavê girêdidin. Birazava bergeşa henê ya ku mûm tê de daçikandine, dide ser serê xwe û li dor zavê digere. Û li dora serê wî digerîne. Bergeş dest diguhêre. Li Dîyarbekirê, mûnikan dikin teyfikên biçûk. 3 kes, her yek 2 teyfikên mûmê digire, hersê li pê hevdu li dora zavê digerin. Li gor tempoya stran, an jî dawil û zirneyê, teyfikek bilind û ya din nizim dikin.

Çend kes dest bi strana "Yek Mûmik" dikin. Yên din jî, li wan vedigerînin. Hemû bi stranê re, li çepikan dixin:



*Li Dîyarberkirê zavê hene dikin.*

## Yek mûmik

Yek mûmik, du mûmik, sê mûmik
Çar mûmik, çardeh mûmik
Serê malê misqalek
Bûk li zavê bimbarek

Ha nîna, ha nîna, nîna
Ha nîna heyran nîna
Ha nîna, ha nîna, nîna
Ha nîna cîran nîna
Kirasê zavayê hol o
Kirasê paşayê hol o
Danîn ber me ye ho
Pêşiya me dibê ho
Zavayê çav li rê ho
- Kanê zavayê we lo?
- Kanê birazavayê we?
- Va ye zavayê me lo!
- Va ye birazavayê me!
- Kanê mêvanên we lo?
- Kanê mazûbanê we ?
- Va ye mêvanên me lo!
- Va ye mazûbanê me lo!
- Kanê tirşika we lo?
- Kanê tirşikvanê we?

- Va ye tirşika me lo!
- Va ye tirşikvanê me!
Yek mûmik, du mûmik, sê mûmik
Çar mûmik, çardeh mûmik
Serê malê misqalek
Bûk li zavê bimbarek
Kî nebêje bimbarek
Pêvede koremarek
Ha nîna, ha nîna, nîna
Ha nîna, heyran nîna!
Ha nîna, ha nîna, nîna
Ha nîna cîran nîna!..

*( Ji herêma Dîyarbekirê )*

Institut Kurde de Paris

Şahiya henê heta ku mûm bihelin dom dike. Bi dor, yek bi yek bergêşa mûman ji hev du digrin, di ser û berê zavê de direqisin. Di dawî de, xort wan mûmên nîvvemirî direvînin. Û weha dawiya şahiya heneyê tê. Birazava hene tîne û dest û lingên zavê hene dike. Dest û lingên wî yên henekirî bi destmalên nû dipêçin û paşê hena mayî jî, li xort û beşdaran belav dikin.

Piştre şîranî (benî, bastêq, mewij) û mêwe tînin û li beşdaran belavdikin. Bi belavkirina şîraniyê re dawiya şeva heneya zavê tê.

Di wê şevê de, li aliyê bûkê jî *serhene* heye. Ji henekirina bûkê re serhene tê gotin. Êvara serhenê ji aliyê zavê çend berbûkî û xwendî diçin alîyê bûkê serhenê. Ji wan jin û keçan re dibêjin "berbûkiyên serhenê." Ew, mirovên zavê yên pêş in. Piranî xwişk, jinbira, jinxal an jî jinmamên zavê ne. Aliyê bûkê xelatên giran ji wan dixwazin. Bûkê jî wekî zavê tînin li ser kursiyekî didin rûniştandin. Wekî ya zavê bergêşa hene tînin. Heneya bûkê jî pêwîst e, ku di destpêkê de *xwîşkebûk* bigerîne. Yên din ji destê xwişkebûkê û piştre jî, bi dor bergêşa heneyê ji destên hevdu digirin û li dora bûkê digerînin. Bi wî awayî heta dawiya helandina mûman têt.

Keç û jin hemû li dora bûkê rêz dibin û dest bi stranan dikin. Yek ji wan stranan jî ya "Ha hene bînin" e. Hinek dibêjin û hinek jî, ji devên wan digirin:

**Ha hene bînin**

Ha bînin bînin bînin
Heneka bûkê bînin
Hene ji boxçê derînin
Hene ji boxçê derînin
Pê bûkê bixemlînin
Pê bûkê bixemlînin
Pê zavê bixapînin
Pê zavê bixapînin
Her hene, hene, hene
Her hene, dîsan hene
Heneka bûka hol o
Heneka bûka hol o
Her bînin, bînin , bînin
Her bînin, hene bînin
Henê ji boxçê derînin
Henê ji boxçê derînin
Pê bûkê bixemlînin
Pê bûkê bixemlînin
Pê zavê bixapînin
Pê zavê bixapînin.
Her hene, hene, hene
Her hene dîsan hene..

Institut kurde de Paris

Varyanta Dîyarbekirê jî weha ye:

**Wer hene**

Hene hene hene hevalê
Hene hene hene delalê
Êvara henê ye hevalê
Êvara hene ye delalê
Bûk hatî hewşê ye hevalê

Bûk hatî hewşê ye delalê
Şewtî dilkê dê ye hevalê
Şewtî dilkê dê ye delalê
Hene hene hene hevalê
Wer hene hene delalê
Hene hene hene hevalê
Wer hene hene delalê
Hene di teştê kin hevalê
Hene di teştê kin delalê
Bi kevçiya avê lê kin hevalê
Bi kevçiya avê lê kin delalê
Li destê zavê kin hevalê
Li destê zavê kin hevalê
Li koma dorê kin hevalê
Li koma dorê kin delalê
Wer hene hene hevalê
Wer hene hene delalê
Wer hene hene hevalê
Wer hene hene delalê!

Peştre yên din jî bergeşa henê ji xwişkebûkê digirin û digerînin. Dema henekirinê bûk destê xwe venake, heta ku ji berbûkiyan yek, zêrekî bixe nav destê wê. Piştî zêrekî dixin nav destê bûkê, destên wê yên henekirî digirin û bi destmalên nexşîn girê didin.

Xwişkebûk sêniyê tîne û jin dest bi avêtina dîyariyên serheneyê dikin. Dîyarî curbe cur in. Berê ji berbûkiyan, bi taybetî ji berbûkiyên mirovên zavê dest pê dike. Ew, zêr an jî pere davêjin. Paşê dor tê ser aliyê bûkê. Ji dê, xwişk û jinbirayên bûkê dest pê dike û ber bi gundiyan ve diçe. Gundî tiştên sivik, wek cihêz û firaqên nav malê davêjin serhenê.

Piştî serheneyê dîsan govend bi stranan geş dibe. Yek ji wan stranan jî ev e:

## Xezala min î

Xezala min î delala min î
De hêlî hêlî hêlî
Xezala min î delala min î
Koçera beriya jêrî
Xezala min î delala min î
Koçer çûne zozanan
Xezala min î delala min î
Torak kirin eyaran
Xezala min î delala min î
Koçera beriya jêrî.
Xezala min î delala min î
Pezê babê te sor e
Xezala min î delala min î
Li çiyayê sor diçêre
Xezala min î delala min î
Xeribî çiqas zor e
Xezala min î delala min î
De hêlî hêlî hêlî
Xezala min î delala min î
Koçera beriya jêrî.
Xezala min î delala min î
Pezê babê te reş e
Xezala min î delala min î
Li çiyayê reş dimeşe
Xezala min î delala min î
Ramîsan çiqas xweş e..

Institut kurde de Paris

## Serşûştina bûk û zavê

Roja dawî ya dawetê, ango roja ku êdî bûk tînin, li serşoya gund ava zavê germ dikin. Birazava û ezebçêrî bi stran û tilîlîliyan zave dibin serşoyê. Li gundan weha ye; lê, li bajaran birazava û ezebçêrî, zavê dibin hemamê. Bi heyte-hol wî dibin û tînin. Di dema çûndin û hatinê de stranan dibêjin. piştre zavê di nav taxê de digerînin. Ji wan stranan yek jî ev e:

Dê zavê bîn serşoyê
Zava hay zava
Dê kurkî bîn serşoyê
Kurik ji nû zava
Lê bireşînin nîmoyê
Zava hay zava
Lê bireşînin nîmoyê
Kurik ji nû zava
Ji bo xatira singbegoyê
Zava hay zava
Ji bo xatira singbegoyê
Kurik ji nû zava.

*(Ji herêma Badînan, ji berhevokên M. Mayî)*

Institut kurde de Paris

Dema xortekî ezeb bimre, li şûştina wî jin "tilîlî" didin û dibêjin *"ava serê zavê ye."* Ango *"wî zavatiya xwe nedît"*

Li hinek herêman ji bo serşûştina bûkê tişteki taybetî çênakin. Bûk serê xwe li malê dişo. Lê li bajaran, bi taybetî li bajarên rojavayê Kurdistana Bakur, hevalên bûkê yên nêz pê re diçin hemamê. Bi

xwe re xwarin, mêwe û şîranî dibin. Ew roj hemamê bi tevayî kirê dikin. Hemam dibe cihê stran û şahiyê. Bi zerikan av li serê bûkê dikin, li ser wê distirin û "tilîlî" didin.

## Lêkirina kincên zavê

Roja ku bûk tê; berî hatina wê kincên zavê lê dikin. Kincên zavê ji mala bavê bûkê tînin. Li hinek herêman bavê bûkê ji zavayê xwe re kinc dikire û li hinek herêman jî, bavê zavê ji lawê xwe re kinc dikire. Lê dixwazî bavê bûkê an jî bavê zavê kincên zavê bikire, divê berî dawetê kincên zavê herin mala bavê bûkê û heta roja dawetê li wir bin. Berî kinclêkirna zavê, xortek, kincê zavê ji mala bavê bûkê digire û tîne mala bavê zavê. Dema kincên zavê ji mala bavê bûkê tên; jin destpêdikin sêniyên kincên zavê dişênin mala zavê. Her malbata ku gaziyê dawetê hatiye kirin, divê sêniya kincê zavê bişeyne mala bavê zavê. Zarok sêniya kincê zavê didin ser serê xwe û dibin mala zavê. Di sêniyên kincê zavê de, bi gelemperî mêwe û şîranî hene.

Di lêkirina kincê zavê de, dawil û zirne dikişin ser banî û hawayê *Her bînin* lê dixin. Qasî çend deqîqan ev hawe dom dike. Paşê kursiyekî tînin û zave li serê rûdine. Nazbalifekî nexşkirî datînin piştê. Li der-dora wî helqe girêdidin. Û dest bi çepikan dikin. Birazava kincên zavê tîne. Hemû bi devekî "tilîlîlî" didin. Zava kincên xwe yên kevin ji xwe derdixe. Bi

tenê derpê lê dimîne. Derpê jî, yê nû ye, ji ber ku wî bîstek berê guhartîye. Birazava paketa kincan vedike û bi îşlik(qûtik) dest pê dike. Çend kes bi hev re dest bi hawê *Her bînin* dikin û yên din jî, li wan vedigerînin:

**Her bînin**

Her bînin, bînin bînin
Her bînin, bînin, bînin
İşlikê zavê bînin
İşlikê paşê bînin
Pê zavê bixemlînin
Pê paşê bixemlînin
Pê bûkê bixapînin
Pê bûkê bixapînin
Birazavayê me dibêyo
Zavayê çav li rê yo.
Her bînin, bînin bînin
Her bînin, bînin, bînin
Şalwarê zavê bînin
Şalwarê paşê bînin
Pê zavê bixemlînin
Pê paşê bixemlînin
Pê bûkê bixapînin
Birazavayê me dibêyo
Zavayî çav li rê yo.

Her bînin, bînin, bînin
Her bînin, bînin, bînin
Goreya zavê bînin
Goreya paşê bînin
Pê zavê bixemlînin

Pê paşê bixemlînin
Pê bûkê bixapînin
Birazavayê me dibêyo
Zavayî çav li rê yo.

Dema dor tê ser lêkirina şalwarê zavê, yek destê xwe davêje devlinga şalwar û nahêle, ku zavê lingê xwe di devlingê re biborîne. Birazava destê xwe dixe berîka xwe û pere derdixe, bexşîşê dide. Ew jî devlingê berdide. Û heta hemû kincên zavê lê dikin, bi wî awayî stran û çepikan didomînin. Dora lêkrinê bê ser kîjan kincî, navê wê dibêjin. Di dawiyê de, şûşa lewantê bi serê zavê de dikin û piça ku tê de dimîne jî, bi ser stranbêjan ve direşînin.

## Şabaş

Berî ku xwendî û berbûkî herin bûkê bînin, **rêza** govendê xweş dikin. Jin ji govendê derdikevin û çiqas mêr hene dikevin govendê. Hingê şabaş dest pê dike. Govend geş û rêz dirêj dibe. Zirnevan û dawilvan çend qoran bi bezê, ji serê rêza govendê diçin heta dawiyê. Mirovên zava yên nêz sergovendgêr in. Ji serî ve şabaş dest pê dike. Zirne û dawil piçek dengên xwe kêm dikin û hevalekî zirnevan û dawilvan derdikeve meydana govendê û direqise. Paşê bi aliyê sergovendgêr ve diçe û li ber wî disekine, bi dengekî bilind: "*şabaaaaaşşşş axayê min*" dibêje. Û navê wî kesî hildide. Xwe li ber lingên wî çend caran li erdê gêr dike û radibe pîyan. Sergovendgêr destê xwe dibe berîka xwe, pere

derdixe û li nav çavê şabaşvan dixe an jî dixe devê wî. Zirnevan, heta ku jê tê li zirna xwe dixe û berê wê berjêr û berjor dike. Dawilvan jî xwe davêje erdê û heta ku jê tê bi gopal û şivika xwe, li dawilê dixe. Bîstek paşê dawilvan û zirnevan dîsa dengên xwe kêm dikin û şabaşvan, xwe çend caran, li erdê gêr dike û pêre digere û ber û berê rêza govendê bi reqis diçe û tê. Navê wî kesê bexşîşdayî dibêje û hejmara pereyê wî dîyar dike. Vê carê dor tê ser yê duyemîn. Şabaşvan, weha hemû kesên ku beşdarê govendê bûne, yek bi yek şabaş dike. Ew kesên ku xwe ji ber şabaşê bidin alî û nayên şabaşê, şabaşvan navên wan tespît dike. Piştî şabaşê, dest pê dike bi dengekî bilind gazî wan dike û li wan digere. Dixwaze ku wan di nav civata dawetê de xirab bike. Heta ku şabaşa xwe ji wan bistîne hêj dev ji wan berdide.

Di dema şabaşê de, carînan dawetvanî bi hevdu re dikevin hemberî û rikê. Yên ku ji hev rik dikin û diqeherin, bi îşaretên çav û destan bangê şabaşvanî dikin û careke din pere didê; yê din jî bangê şabaşvanî dike û ew jî careke din şabaşê dide. Carnan weha dibe, heta ku şer jî, di nav aliyan de derdikeve.

Piraniya dawilvan, zirnevan û şabaşvanan mitrib in. Ji derî wan yek vî karî nake. Ji xwe, ew aboriya xwe bi karê weha dikin. Carnan mitrib dek û dolab digerînin û berî şabaşê pere didin hinek kesan, ji bo ku ew zêde bavêjin û yên din jî li wan binêrin û ew jî zêdetir pere bidin wan. Bi wî awayî lîstik li serê dawetvaniyan çêdikin. Piştî şabaşê bi dizî dîsan pereyên wan kesan bi paş ve didin wan.

Di piraniya dawetan de, şabaş, bi tenê ji bo mêran çêdibe. Dema ku ji bo mêran be, wê çaxê, dê û hinek

jinên mirovên zavê jî şabaş dikin. Lê, di hinek dawetan de, piştî şabaşa mêran, ev car mitrib diçin aliyê jinan û jinan jî yek bi yek şabaş dikin. Jin li gor mêran gelek kêm pere davêjin ser şabaşê. Hinek ji wan jî, direvin, şabaşê nadin. Dibêjin; *"mêrê min daye."*

Xwediyê dawetê, carnan li ser şabaşê pêşî bi mitriban re, li hevdu dikin. Heger ew û mitrib li ser şabaşê bi hevdu bikin û bi taybetî mitrib qîma xwe tenê bi şabaşê bînin, wê çaxê xwedîyê dawetê ji derî şabaşê pereyekî din nade wan. An jî mitrib şabaşê hindik bibînin, ji derê şabaşê jî, pere ji xwediyê dawetê dixwazin.

Li hinek herêman du şabaş hene. Yek ya ku me li jor behsa wê kir û ya diduyan jî, dema ew kesên bi nav û deng ji der ve têne dawetê, mitrib pêrgehê wan ve diçin û ew şabaş dikin.

## Nivîsandina cihêzên bûkê

Piştî serheneyê ku êdî cihêz û dîyariyên bûkê temam dibin, ji aliyê bûk û zavê çend kesên pêş tên, gazî çend şahîdên rîspî û nivîsvanekî dikin. Berê timî nivîsvan meleyê gund bû, lê niha bi piranî mamosteyên gund wî karî dikin. Û yê aliyê bûkê yek bi yek navê cihêzan û bihayê wan dibêje. Nivîsvan, lista cihêzan temam dike û bihayê wan jî, yek bi yek dixwîne. Paşê encama bihayan ji civata hazir re dibêje. Hemû qebûl dikin. Di serî de nivîsvan û pê re

Institut Kurde de Paris

ew kesên aliyê bûk û zavê (bi piranî, bav, ap an jî birayên wan) îmza dikin. Paşê berpêşê îmzayên şahîdan dikin. Lê tiştek heye, ku bihayê cihêzê bûkê sed hezar be ew çarqat-pêncqat dinivîsîn. Ev dibe belge, dema bûk û zave ji hevdu biqetin, bûk dikare wî malê xwe ji zavê bistîne, an jî bihayê wan tiştan ji mala bavê zavê bi paş ve bigire.

Ev nivîsar di nav her du aliyan de dibe wek senedeke nîv resmî. Lê dîsa, di pratîkê de piranî weha nabe. Min bi xwe çend caran tiştê weha dît, ku bi tenê kinc û zêrên bûkê bi paş ve didan wê.

Lê, di vî karî de, nivîsvan tenê bi qezenç derdikeve. Dema nivîsandina cihêz diqede, du cot goreyên herî baş didin wî. Heger meleyê gund ne nivîsvan be û di dema nivîsandinê de beşdar bibe, pêwîst e, ku dîsan mele jî, ji bîr nekin.

Institut kurde de Paris

## Guhaztina bûkê

Roja dawî êdî xwendî û berbûkî, karûbarê çûndina bûkanînê dikin. Heger bûk, di eynî gund an taxî de be, bûkderanîn an jî guhaztin gelek hêsa ye. Wê çaxê xwendî û berbûkî, bûkê çend qoran di nav gund de digerînin û tînin mala zavê bi cîh dikin. Lê, bûk ne di gund de be û ji gundekî din bînin, wê çaxê rê

dirêj dibe û anîna bûkê bi serê xwe dibe daweteke



rengîn. Xwendî û berbûkî xwe girêdidin. Heger du dawil û du zirnevan hebin, cotek li ba dawetê dimîne û cotek jî, bi xwendî û berbûkiyan re diçe pey bûkê. Ji bo bûkê hespekî taybetî yê bi zîn hazir dikin. Mirovekî zavê yê pêş lê siwar dibe. Ew kes pawanê hespê bûkê ye. Ew divê hespê bûkê baş biparêze, ku kesek li hespê bûkê siwar nebe û tiştek di zengoya wê de derbas neke. Heger yek tiştek di zengûya hespê de derbas bike, li gor hinek baweriyan, wê çaxê zava tê girêdan û êdî ew nikare bizewice.



INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHEQUE

Bi teqandina çekan re dest bi çûndinê dikin. Xwendî bi siwarî çend qor li dora gund diçin û tên. Dibe hîre - hîr û fîşe - fîşa hespan. Xwendî û berbûkî ji gund dikişin û li rê kar dibin. Dîsan dibe teqe-teqa çekan û wendî dest bi pêşbirika hespan dikin.

Xwendî û berbûkî dema digehên nêzî gûndê bûkê, xwediyê dawetê li xwendiyan tembîh dike, ku hîç çek bi kar neyînin. Ji ber ku mala bavê bûkê û gundiyên wan bi hêrs nebin. Dema ew digehên ber dergehê mala bavê bûkê, mirov û gundiyên bûkê tên pêşiya wan. Xort hevsarên hespan ji wan digirin û hespên wan girêdidin. Berbûkî, diçin hundir û xwendî li der dimînin. Gundiyên bûkê der-dor li xwendiyan digirin û henek bi wan dikin. Çaket û paltoyên wan ji wan derdixin û çekên wan ji wan distînin. Dest didin ser hespên wan. Ev tê wê manê ku hûn bindestên me ne. Em we dişelhînin. Dema bûk dertînin û bi rê dikevin hêj kinc û çekên wan bi paş ve didin. Carnan jî nadin wan, çend roj paşê ji wan re dişênin. Li ser vê yekê stranek jî heye. Tê gotin ku aliyê zavê hemû kar û barên xwe kirine, lê aliyê bûkê poşman bûne. Ew naxwazin bûkê bidin û ji ber vê yekê jî şertên nû davêjin pêş wan. Destê bin kevir e, ew jî şertên wan, yek bi yek bi cîh tînin. Di dawî de bi qirên û cirên bûkê ji wan distînin. Ev bûyer bûye strana "Bidine me bûkîna me" û bi vê staranê bûkê derdixin.

Berbûkî, li hûndir kara derxistina bûkê dikin. Bûkê dixemilînin. Bûka dest û ling bi hene, ev car çavên wê kil dikin. Bisk û guliyên wê çêdikin. Cil û bergên kurdî yên rengîn lê dikin. Xêlîyekê sor û mezin bi ser serçavê wê de berdidin. Bi temûzî û şehrên rengîn xêlîyê girê didin. Di nav Kurdan de rengê sor



Berbûkî dixwazin bûkê biguhêzin.

jîyana serfîraziyê ye. Li hinek herêman davêjin ser serçavê wê û çarşeveke sor lê dikin. Wê li nav malê didin ser kursîyekî. Çend berbûkî ango jinên aliyê zavê dikevin destên hevdu. Li hember rêza wan çend jinên aliyê bûkê jî dikevin destên hevdu û rêzeke din çêdikin. Yên aliyê zavê dest bi strana "*De bidine me bûkîna me*" dikin. Yên aliyê bûkê jî bi stranê bersiva wan didin: "*Em nadine we bûka we.*" Stran weha ye:

### Dê bidine me bûka me

- Dê bidne me bûka me
Bidine me bûka me!

- Em nadin, em nadin
Em bûka xwe nadin
Enî deqa xwe nadin
Navteng- zirava xwe nadin

Institut kurde de Paris

Bejin têla xwe nadin
Heta neyê kemero.

- Kemera wê haziro
Hêj duho heta pêro
Bes hecetan me bigiro
Malgêt me li hev dûro
Li ber çemê Xabûro
Serçiyan ser keşandin
Defçiyan def dirandin
Dê bidine me bûka me!

- Em nadin, em nadin
Em bûka xwe nadin
Xizêmşora xwe nadin
Heta neyê guharo.

- Guharên wê haziro
Hêj duho heta pêro
Bes hecetan me bigiro
Malgêt me li hev dûro
Li ber çemê Xabûro
Serçiyan ser keşandin
Defçiyan def dirandin
Dê bidine me bûka me!

- Em nadin em nadin
Em bûka xwe nadin
Bejnbilinda xwe nadin
Heta neyê fistano

- Fistanê wê haziro
Hêj duho heta pêro
Bes hecetan me bigiro



Institut kurde de Paris

Malgêt me li hev dûro
Li ber çemê Xabûro
Serçiyan ser keşandin
Defçiyan def dirandin
Dê bidine me bûka me!

- Em nadin, em nadin
Em bûka xwe nadin
Çav beleka xwe nadin
Heta neyê hîzaro

- Hizara wê haziro
Hêj duho heta pêro
Bes hecetan me bigiro
Malgêt me li hev dûro
Li ber çemê Xabûro
Serçiyan ser keşandin
Defçiyan def dirandin
Dê bidine me bûka me!

- Em nadin, em nadin
Em bûka xwe nadin
Gerdanspiya xwe nadin
Heta neyê gustîlo.
- Gustîla wê haziro
Hêj duho heta pêro
Bes hecetan me bigiro
Malgêt me li hev dûro
Li ber çemê Xabûro
Serçiyan ser keşandin
Defçiyan def dirandin
Dê bidine me bûka me!

*( Ji Kemal Culemergî )*

Institut kurde de Paris

Li gelek hêlên Kurdistanê di dema bûk henekirin û derxistinê de vê strana han jî distrin:

**Bûkê delalê**

Bûkê delalê rabe xwe kar ke
Xemla xwe girêde şara xwe veke
Şûşa miskê bi serê xwe dake
Zava şêrîn e, xortekî pak e!

Bûkê delalê çendê tu hêja yî
Tu xweşik î, rewşa mala yî
Weke gula sor î, nav werda yî
Tu ezîza ber dilê zava yî!

Bûkê delalê xwe megrîne
Hemî ji te re xizmetçî ne
Bes dilê zavê nehelîne
Zava delal e, çendî şêrîn e!

Bûkê delalê, bûka Kurda yî
Wek şemamoka nava werza yî
Çendî şêrîn î, çendî tu şa yî
Tu ezîza ber dilê zava yî!

De kesra teze ji dayka xwe ye
Qîrîn û girîn bê fêyde ye
Ez dikim herim pêşîya te ye
Bawer bike zava bi dilê te ye!..

(Ji herêma Botan)



Institut kurde de Paris

Berbûkî ji aliyê din ve, dest bi diziya kevçî û tiştên mala bavê bûkê dikin. Ji aliyê mala bavê bûkê jî, çend jin hem bi dizî ji paş ve kêysê li berbûkiyan bînin, bi meqes an bi cîletan perçe ji kincên wan dibirin û hem jî nobedariyê dikin, ku kes diziyê neke. Lê, ne gengaz e, dîsan her berbûkiyek bi kêmasî çend kevçî an jî teyfikên mala bavê bûkê didizin. Wan kevçî û teyfikan tînin, dema ku bûk tê ber dergehê mala zavê, berbûkî ji wan kevçî û teyfikan yekê-diduyan davêjin ser xanî û zavê ew dide bin lingê xwe û dişkîne.

Li herêma Cizîrê Berbûkî, bûkê bi vê stranê dertînin:

Wel ûli ye, wel ûli ye
Salîma Leyla razîme
Leylê wel ûli ye!
L' me dereng e babê bûkê
Me anî, me birê Xile
Babî kire!

Dema berbûkî dixwazin bûkê ji mala bavê wê derînin, ji mirovê bûkê xortek xwe dide pişt derî û nahêle bûk derkeve, heta ku *piştderî* (pişteder) bidin wî. Carnan bazara piştderiyê demekê dirêj digire. Pişderîvan dîyariya xwe ya dawî jî digire û hêj derî ji bûk û berbûkiyan re vedike. Êdî berbûkî û xwendî, ji hemû qeda û belayên mala bavê bûkê rizgar dibin. Bi "tililîlî" dixwzin bûkê li hespê siwar bikin. Bûk xwe di de erdê û naxwaze li hespê siwar bibe, xeta ku ew xelata xwe negire. Berbûkî û xwendî

sozê xelatê didin bûkê û ew jî dev ji rika xwe berdide û wê li hespê dikin. Ji mirovên zavê yek ji aliyê rastê û yek jî, ji aliyê çepê ve, bi bûkê digirin û yek jî bi hevsarê hespê wê digire û dikişîne. Ev her sê kes heta bûkê bixin hundir, parezgehên bûkê ne. Bûk, di nav berbûkî û xwendiyan de, wekî gula sor ji dûr ve xuya dike.



*Bûk li hespê siwar nabe û dîyariya xwe dixwaze.*

Cihêzê bûkê di dixin sindoqan û li hespekî an, li hestireke bar dikin. Kilîtên sindoqan di berîka bûkê de ne. Yek bi taybetî bi vî cihêz û barxaneya bûkê re dilepike. Di dema barkirina cihêz de, heger sindoq kêm û sivik bin, wey xwelî li serê mala bavê bûkê! Hema ji wê derê dest bi henekan dikin û gotinên nebaş ji bav û diya bûkê re dibêjin. Bi siwarî çend berbûkî didin pêş û berbûkî û xwendiyên din jî bi

siwarî didin paş bûkê û ji gund bi rê dikevin.

Êdî, ew ji stembariya mala bavê bûkê rizgar bûne. Ji ber ku mala bavê bûkê gelek zerar li wan kirine û ew êşandine. Êdî berbûkî û xwendî dixwazin heyfa (tola) xwe ji mala bavê bûkê bigrin. Vê carê dora berbûkî û xwendiyan e.. Li dorhêla Diyarbekir û Bedlîsê dest bi strana *Yarila* dikin û bi vê stranê dixwazin heyfa xwe ji mala bavê bûkê bigirin. Ew dixwazin mala bavê bûkê û cîranên wan dengê stranên wan bibîhsin:

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**Yarila**

Yarila yar xezûr xezûr xezûr
Ê wela kûçkê sor ê ber tenûr
Yarila xezûr bikin kadînê
Ê wela xezûr bikin kadînê
Maşellah lê kin cilka mehînê
Yarila heya germa havînê
Ê wela heya germa havînê
Yarila mar û mişkan bibînê
Ê wela parî eqil hilînê
İnşellah piçek eqil hilînê

Yarila yar xesû xesû xesû
Ê wela kûçika sor a ber tenûr.
Yarila xesûyê bikine kadînê
Ê wela xesûyê bikine kadînê
Maşellah lê kin cilka mehînê.
Yarila heya germa havînê
Ê wela heya germa havînê

Yarila mar û mişkan bibînê
Ê wela parî eqil hilînê
İnşellah piçek eqil hilînê

Li dorhêla Botan û Badînan varyanteke din heye, ku ew jî weha ye:

Ê lêylo maşallah
Yar xesûwê xesûwê

Ê lêylo maşallah
Xwezî xesû nebana

Ê lêylo maşallah
Bûk bi dilê xwe bana

Ê lêylo maşallah
Xesû bibine koxêyo

Ê lêylo maşallah
Lêkin cilka kerê yo

Ê lêylo maşallah
Xesû bibine kadînê

Ê lêylo maşallah
Lêkin cilka mehînê

Ê lêylo maşallah
Xesûwê bibin ba keşe

Ê lêylo maşallah
Lêkin cilka pelaşe

Institut kurde de Paris

Ê lêylo maşallah
Bangewrê serê tûwê

Ê lêylo maşallah
Heft gora qirikciwê.

*( Ji devê Nîmetê Cizîrî )*

Xwendî çaxê piçek ji gund dûr dikevin, dest davêjin çekên xwe û bi ser gund ve diteqînin. Gundiyê bûkê jî, ji ber ku bi vê yekê dizanin, ew jî, ji xwe amade ne, hema berê çekên xwe bi ser wan ve dikin û bi teqandinê bersiva wan didin. Heta ku berbûkî û xwendî ji hafa gund wenda dibin, teq req dom dike.

Zarok û xortên gund ên li ser riya bûkê dizanin, ku dê ew roj bûkek di gundê wan de derbas bibe û heziriya xwe dikin. Ew rê û neqebên teng li pêş bûkê digirin. Çend werîsan bi ser hevdu ve girêdidin û bi werisan rê li wan digirin, ku bûk nikaribe derbas bibe. Dema xwendî û berbûkî tên ba riya girtî, mirovên zavê tên ba wan, ji bo *pacerê* pere didin wan û kêr ji berîka xwe dertînin û werîsên wan diqetînin. Hinek jî carnan pezek digirin û tên ser rê, ji wan pacerê ' dixwazin. Pirî caran karikek tînin ser riya bûkê. Ji ber vê yekê jî, ji vê pezê re dibêjin **karika zavê.** Dîsa mirovên zavê kêrên xwe ji berîkên xwe dertînin û didin qirika pezên wan ku serjê bikin. Lê, pacevanan dixapînin û ditirsînin. Di dawîyê de, bi tenê guhên pezên wan jêdikin û xwîn dirjînin. Û paşê pacerêya wan jî didin. Carnan jî, bi rastî pezê serjê dikin û



Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Xwendî û berbûkî, bûkê ji gundek dibin gundekî. Pavan bûkê diparêzin

pereyê wê jî didin. Wê çaxê xort û zarok sîtilekê tînin, goştên xwe dipêjin û bi hevdu re dixwin.

Li bajaran jî berê zarokan riya paytonên dawetê digirtin û niha jî riyên otomobîlan digirin û pacerê ji wan dixwazin. Niha li bajaran bûkê dikin otomabîleke nû. Otomobîla bûkê dixemlînin û bebekek bi pêşiya wê ve dikin. Otomobîlên berbûkî û xwendiyan jî didin pey wê. Tax bi tax di nav bajêr de, bi konvoyên otomobîlan ve digerin. Stranan dibêjin, "tilîlî" dikin. Dibe tûte-tûta klasksîyonên otomobîlan. Li ser kamyonetên vekirî jî dawil û zirne lê dixin.

Xwendî di nav xwe de hespên xwe dibezînin û siwartiya hevdu dicerbînin. Hespên xwe bi kîlometrêyan pêş ve dibezînin û dîsa bi paş ve, bi ser bûk, berbûkî û xwendîyan ve dizivirin. Li ser pişta hespan carnan kumên hevdu direvînin û carnan jî bi şivikan li kumên hevdu dixin û dixin erdê.

Li hinek herêman carnan çend kes di nav xwe de dibin aliyê zavê û çend kes jî dibin aliyê bûkê. Ew dixwazin solên bûk û zavê ji lingê wan derînin û birevînin. Yên ku solê direvînin aliyê din didin dûv wan. Heta pere nedin solê ji paş ve nadin. Ji ber vê yekê jî, di rê de çend kes çavdêriya bûkê dikin. Li hinek herêman jî, çi sola bûkê û çi ya zavê tê revandin, aliyê din pere dixe solê û kesê ku solê revandiye pere ji wê/wî re dimîne.

Heger daweta berdêliyan be, divê di wê rojê de herdu bûk bên guhartin. Heger herdu bûk li gundekî nebin; di nabera herdu gundan de, cihekî kifş dikin. Her alî keça xwe tîne wî cihî û wan li wir diguhêrin û her yek bûka xwe digire û bi paş ve vedigere. Carnan kîjan alî dê pêşî bûka xwe bigire û here; li ser

Institut kurde de Paris

vê bûyerê lec û şer derdikevin. Rîspî û mezinên wan dikevin navberê û dozê çareser dikin. Heger herdu bûk jî, li gundekî bin herdûyan tînin meydana gund û wan li wir diguhêzin.

Xwendî û berbûkî pêwîst e, ku di riya çûn û hatinê de piçek be jî, guhartinek çêbikin. Dema di riya çûn û hatinê de gûhartinek çênekin, ji bo bûk û zavê nebaş dibe. Dibe ku bêyomtiyek bê serê wan. Ji ber wê baweriyê di cîhekî de, riya çûn û hatinê tê guhaztin.

Dema ji gundê zavê re çend kîlometre dimîne, siwar heta nêzî gund hespên xwe çend qoran dibezînin û dîsan bi paş ve, bi ser xwendi, berbûkî û bûkê ve vedigerin. Ew agahdari ye, ku didin mala zavê *"kara xwe bikin, me bûkê anî."*

Dawilvan, zirnavan û govengêr jî, tev ji gund der dikevin û pergê bûkê ve diçin. Di navberê de carnan dawil û zirne disekinin û govendgêrî dest bi stranan dikin. Yek ji wan stranan jî ev e:

**Bûk hatiye Golê yo**

Bûk hatiye Golê yo
Weylo, weylo,weylo
Weylê,weylê,weylê
Bûk hatiye Golê yo
Dayikê dilxerîbê!

Çavên dayikê li rê yo
Weylo,weylo,weylo
Weylê,weylê,weylê

Dayikê dilxerîbê!

Bûk hesreta mala bavê yo
Weylo, weylo, weylo
Weylê, weylê, weylê
Dayikê dilxerîbê

Bûkê megrî, zava xort e
Weylo, weylo, weylo
Weylê, weylê, weylê
Dayikê dilxerîbê.

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

*( Ji herêma Licê )*

Institut kurde de Paris

Zava, birazava û ezebçêrî tifingên wan di dest wan de, derdikevin ser baniyê mala zavê. Zava berîkên xwe tijî pereyên hûr û şekir dike û li ser banî benda hatina bûkê radiweste. Çend jin jî, li ber dergeh bûkê dipên. Ji wan yek şerbika avê û hêkek di dest de, ew lî benda hatina bûkê ne. Di destê xesûya bûkê de jî derxûn û heskek heye û wekî şûr û mertal bikartîne. Ew bi "tililî" û bi reqis ber bi kûkê ve diçe, bi mana ku tirsa xwe bixe ser bûkê. Di jîyana malê de bûk li hember wê dernekeve. Her tim di gotina wê de be.

Dawil û zirne di pêşiya bûkê de, bi hawayê *Hey li min xerîbê* lê dixin û li dûv wan berbûkî û xwendî ber bi mala zavê ve tên. Di pêşiya bûkê de xortek neynika (eynika) bûkê ya mezin bi herdu destan digire. Neynik mezin e, ya bejnê ye. Temûziyeke sor bi ser ve berdayî ye. Neynik sembola ronahîyê ye.

Carnan dawil û zirne radiwestin û bi tenê berbûkî dest bi hawayê Heyla li min xerîbê an straneke din dikin û ji devê hevdu digirin:

## Heyla li min xerîbê

Heyla li min xerîbê,
Heyla li te xerîbê
Xerîba Xwedê me
Delala Xwedê me
Dara li devê rê me lê
Bi hesreta mala babê me!

Xerîbê çi gotî
Delalê çi gotî
Cotyar çûne cotî
Xerîbê kember firotî.
Heyla li min xerîbê
Heyla li te xerîbê
Xerîb ezo ezo
Delal ezo ezo
Daran girtî gezo
Hemî çûne, mame ezo

Heyla li min xerîbê
Heyla li te xerîbê
Xerîba çiyê me
Delala çiyê me
Toyê mîya me lê
Bi hesreta mala babê me!

Heyla li min xerîbê
Heyla li te xerînê
Bê tal û nesîbê
Xwedê neke kes
Bê xwedî be

Xerîba Xwedê me

Dela Xwedê me
Darka li devê rê me
Bi hesreta mala babê me

Xerîbê çi gotî
Delalê çi gotî
Cotyar çûne cotî
Xerîbê kemer firotî

Heyla li min xerîbê
Heyla li te xerînê
Bê tal û nasîbê
Xwedê neke kes
Bê xwedî be

Heyla li min xerîbê
Heyla li te xerînê
Xerîb ezo ezo
Dara girtî gezo

Sitila binî kun e
Li ber şetê mezin e
Şûştine wel li bîra min e.

Heyla li min xerîbê
Heyla li te xerînê
Bê tal û nasîbê
Xwedê neke kes
Bê xwedî be.

*( Ji devê Êmoya Licî )*

Institut kurde de Paris

Dema bûk digehê  ber dergehê mala zavê, ew her du mirovên ku bi kêlek ve pê girtine, dixwazin wê ji hespê peya bikin. Lê, bûk lingên xwe ji zengoyan dernaxe û naxwaze peya bibe, xelata xwe dixwaze. Ji xwendî û berbûkiyan hinek dibêjin:

*"Me bizinekê da te, de peya bibe !"*

Bûk peya nabe. Gayekî didine wê, peya nabe. Zêrekî pê re soz didin. Bûk dema hîn jî rik bike û peya nebe, dibêjin:

*"Me zava da te, ka  peya bibe lê!"*

Bûk lingên xwe ji zengoyan dertîne û ew her du kesên alîkar jî pê digirin û wê peya dikin. Zava, bi birazava û ezebçêran  ve, li ser banî li ber *darika zavê* ne. Zava dest dike berîka xwe, perên hûr û şekiran derdixe û bi ser bûkê ve direşîne. Ji darika zavê jî çend şekir û şîranî jê dike û wan jî bi ser bûkê ve davêje. Zavê lingê xwe li axa banî dixe û hinek ax bi ser bûkê re direşîne. Ev axa ku bi ser bûkê ve berjêr tê, nişana xêr û bereketê ye. Li hinek herêman jî zava sêv davêje bûkê. Ji bo ku serê bûkê ne êşe, tiştekî hişk dikin binê kum an jî temûziya ku li serê wê ye. Sêv, sembola hezkirin, şahî û xweşiyê ye.

Zarok dest bi berhevkirina pere û şekir dikin. Zava,  dest davêje çeka xwe û diteqîne. Pêwîst e, ku çeka zavê di carekê de biteqe. Dema di carekê de neteqe, tê wê manê ku karê wî dê baş neçe. Li pey zavê birazava û  li pey wî jî, herkes çekê xwe diteqînin. Girrên û gurmên dide ser gund. Hesp ji teqên û reqêna çekan vediciniqin û direvin. Berbûkiya ku ji mala bavê bûkê kevçî û teyfikan

dizîye, wan davêje ser xanî ba zave. Zavê bi hêz lingê xwe lê dixe û wan dişkîne. Heytehol û tilîlîliya jinan dinê radike temaşê.


Institut kurde de Paris

*Kûza taybetî ya ku bûk li nav dergeh dixe û dişkîne. Ev kûz sembola ronahî û xweşiyê ye. Ji aliyê jinan ve tê çêkirin.*

Ew jinên ku ba dergeh rawestane, hêk didin destê bûkê. Bûk hêk li ser çardera dergeh dixe û dişkîne. Genim li serê bûkê dikin. Paşê şerbika (kûza - cera) avê didin destê wê. Bûk, ew jî, li erdê dixe. Divê di careke de şerbik hûr bibe. Heger di careke de şerbik hûr nebe, zikê wê yê pêşîn dibe ku keç be. Li hinek herêman jî, dema bûk tê ba dergeh, dayîka zavê ango xesûya bûkê, kulozekî tijî gûz, mewij, loqum û pere dike û li ber pîyên bûkê li erdê dixe. Zarok lê kom dibin. Li herêma Semsûrê di şûna hêk de, henarekê didin destê bûkê û bûk wê li ser dergeh dixe û dişkîne.

Berbûkî, bûkê dibin hundir. Êdî wezîfê xwendiyan tewa dibe. Lê, yê berbûkiyan dom dike. Zarok hespan ji xwendiyan digirin û wan hêdî hêdî li nav gund digerînin, ku xwêdana wan sar bibe û paşê jî wan dibin bi daran ve girêdidin.

Berbûkî, bûkê li hundir datînin ser kursiyekî. Lawikekî biçûk dikin hemêza wê , ji bo ku nuxûryê ( zikê) wê yê pêşî law be. Û berbûkî der û dor li bûkê digrin. Berbûkî, di mala bavê bûkê de, pere dixin binê sola bûkê ya rastê. Dema ku wê didin ser kursiyê, zarokek sola wê ji lingê wê dertîne û pereyê têde ji xwe re digire. Jin, li çepikan dixin û stran dibêjin. Govêndê geş dikin.

Lê, li Cizîrê piştî peyabûna bûkê, zavê jî tê hûndir. Ew û bûk li kêleka hevdu rûdinin. Ji wan re şerbet tînin. Zave lingê xwe datîne ser lingê bûkê (li hinek herêman jî, bûk lingê xwe datîne ser lingê zave) û herdu jî destên xwe bi şerbetê dişon. Paşê her yekê qurtek vedixwe û zavê derdikeve û diçe der.

Bûk digirî. Berbûkî dixwazin dilê bûkê bi dîlokan xweş bikin. Yek ji wan dîlokan ev e:

**Berbûkiyek**

Xaniyê bavê bûkê kort e
Li ser xênî kort e mort e
Bûkê megrî, zava xort e!

Bavê bûkê gurê nêr o
Li ser xênî bê didêro
Bûk hêja ye tûrek zêr o

Xwakê bûkê em hatin te yo
Bike kar û bara xwe yo
Zava xort e, bi dilê te yo

Bûkê delalê, rabe xwe kar ke
Şûşa gulavê bi serê xwe dake
Zava ciwan e, xortekî pak e.

*( Ji herêma Mêrdînê û ji Folklora Kurdî - Cigerxwîn)*

Institut Kurde de Paris

## Tirşik

Jin, li der- dora bûkê govendê geş dikin; lê, ji bo mêran dawiya dawetê hatîye. Êdî dema tirşik xwarin (birinzer) û belavbûnê ye. Tirşik, xwarina Kurdan a netewî ye. Lê, li hinek herêman gotina "tirşikê" bi gelemperî ji bo xwarina dawetê bi kar tînin. Dema bi yekî xort henek bikin û bixwazin ku daweta wî çêbikin, dibêjin:

*"Em dê kengê tirşika te bixwin lo?"*

Xwediyê dawetê, ji bo çêkirin û amadekirina tirşikê hîn ji roja ku herin bûkê bînin, ji sibehê ve wezîfe didin çend mêr û jinan. Karên mêran jî ew e, ku çend pez serjê bikin, goştên wan hûr bikin û karê mayî dispêrin jinên kevanî. Jinên kevanî jî, çend sîtil ên tirşik û goşt datînin erdê. Firingî (balîcanê sor), balîcan, îsot û pîvazan hûr dikin û wan dixin kazanan û agir didin binê wan. Ji aliyê din ve, sîtilên savarê dadidin, heta ku bûk tê gund hingê tirşik hazir e.

Li ser banekî rêz bi rêz meşref û oberan radixin û fîraqên xwarinê li ser wan rêz dikin. Hemû mêrên ku hatine dawetê bi zarokên xwe yên lawîn ve, li xwarinê kar dibin.

Dîsan li hinek herêman piştî tirşikxwarinê rûyê zavê vedikin. Çarşevek radixin û her kes li gorî xwe pere davêje ser.

Piştî tirşikxwarinê vexwendî yek bi yek xwediyên dawetê û bi piranî bavê zavê pîroz dikin, destûr û xatirê xwe dixwazin û diçin mala xwe. Herweha çendek paşê jin jî, li hundir xwarina xwe dixwin û ew jî belav dibin. Li ser belavbûna jinan ya dawetê, gotineka pêşiya heye:

*"Dawet fîrrikî, berbûkî hetikîn!"*

Piştî tirşikxwarinê mitrib bexşîşa xwe ji mala bavê zavê digirin. Bi serhaweyek re dawiya dawetê didin dîyar kirin. Li hinek herêman jî, piştî tirşikxwarinê şabaş tê.

Birazava, zavê digre û dibe mala xwe zîyafetê. Li wir benda şevê û bêdengiyê dimînin.

Institut kurde de Paris

Li hinek herêman jî, çaxê bûk li ber dergeh peya dibe, zavê rast li ser banî dibin mala birazava. Û xortên gund yên ezeb li wir dileyîzin, xelkê mehkeme dikin û ceza didin wan. Heta dibe şev mehra bûk û zavê dibrin, hêj birazava radibe zavê dibe cem bûkê.

## Mehrbirîn

Îro di nav Kurdan de, çend curên mehrbirînê hene. Yên misilman, li gor prensîb û edetên misilmantiyê, yên elevî li gor prensîn û edetên elewîtiyê, yên Êzîd li gor presîb û edetên Êzîdîtiyê, yên Xirîstiyan li gor prensîb û edetên Xirîstiyaniyê û li bajaran jî, li gor qanûnên dewletên ku Kurd di bin bandora wan de ne, mehrê dibirin. Ji derî mehrbirînê û hinek nûansên biçûk, şîranî û dawetên Kurdên Misilman û yên ne Misilman hema hema wek hevdu ne. Çawan mele mehra Kurdên misilman dibire, herweha mehra Kurdên Êzîdî jî şêxê Êzîdiyan mehra Kurdên Elevî jî mele an yekî serwext dibire. Misilmantiyê li ser hemû Kurdan tesîr kiriye. Ew Kurdên ku ne misilman in, her çiqas misilmantiyê qebûl nekir bin jî, bi darê zorê û şermê, gelek tişt ji misilman girtine û li gor dîn û mezhebê xwe form danê.

Mehrbirîn li gor herêman tê guhartin. Li hinek herêm û gundan, mehrbirîn berî dawetê û li hinek herêm û gundan jî, piştî bûkguhaztinê tê birîn. Lê, bi gelemperî piştî bûkguhaztinê mehr tê birîn.

Çaxê diçin bûkê tînin, miroveki xuyanî, an yekî oldar destûra mehrê ji bavê bûkê digre. Herweha yek jî, ji zavê destûr digire. Êdî di dema mehrbirînê de, ew kes di şûna bavê bûkê û yê din jî di şûna zavê de

dipeyîve. Heger bavê bûkê tûne be, destûr ji bira, an ji kal û apê wê digirin. Carnan kefaletî jî bi peran e. Heta ku pere nedin bav, an ew mirovê bûkê, destûra mehrê nade. Mele, bavê bûkê û du şahid li cihekî xalî dicivin û dest bi mehrbirînê dikin.

Mehrbirîn, karekî gelek bi dizî û girîng e. Pêwîst e, ku li cem wan kes tune be û tû kes dengên wan nebîhîse. Li gor hin baweriyan heger di dema mehrbirînê de, yek xwe ji cîh bilvîne, an jî ew deng here yekî û di wê demê de yek girêyek li ben bixe, an jî tilîyeke xwe buqrêfe, wê çaxê zava tê girêdan. Êdî vekirin gelek zahmet çêdibe. Heger ben girê bidin û bavêjin binê bîrê, wê çaxê jî, êdî vekirin ne mumkun e. Ji ber van baweriyan mehrbirînê gelek girîng digirin. Dîtineke din, dibêjin dema çend meh di ser girêdana ben de derbas bibe, êdî ew bi xwe vedibe. Ji ber ku ben dirize. Carnan jî, texmîn dikin û diçin ba wan kesên ku guman ji wan dikin; ji wan re lava û tîkan dikin, ku benê girêdayî vebikin, da ku bûk û zave bizewicin. Riyeke din jî ev e, ew kesên ku ji wan guman dikin, bi dizî perçek ji kincên wan didizin û tînin. Ew perçeyê kincên wan dişewtînin û bîhna pîsoyê wê didin ber pozê zave û bûkê.

Kurdên Êzîdî, xirîstiyan, misilman û di nav misilmanan de jî yên Sunî û Elewî keç nadine hevdu. Heta her ol û mezheb di nav xwe de jî, li gor dewlemendî, xanedantî, malbatî, gundîtî û bajartî keç didin hevdu. Mesela Kurdekî normal nikare keça mîrek, axayek, xanedanek, serokeşîrek, şêxek an seyîdek bixwaze. Her kes li gor sinif (pol, çîn), mezheb an ola xwe, keç dide û distîne, Lê, carînan nikarin pêş li dilketiyan bigrin. Ji hevdu keç direvînin. Dema dizewicin mêr li ser kîjan dîn be, jin jî diçe ser wê dîn, an mezhebî. Lê, niha Kurd hewqas

guhnadin dîn, mezheb û sinifan.. Zanabûn û kurdperweriyê rola cudabûna dîn û sinifî kêm kiriye û dike.

Dema mehrê dibirin, mele ji bavên bûk û zavê an jî ji kefîlên wan 3 car dipirse, ku ew razîne ku mehrê bibirin. Ew "Belê" dibêjin. Mele dest pê dike çend ayet dixwîne û di huzûra wan de mehrê dibire. Mele ayetan dixwîne û paşê hemû bi hevdu re fatîhe dixwînin. Ev kar gelek hêdî û bi dengekî gelek nizim dibe, ku deng neçe tû kesî. Bavê zavê an kefîlê zavê heqê birîna mehrê dide mela û hemû ji hevdu xatir dixwazin û belav dibin.

Şêxê Êzîdiyan jî, li ser navê ro, hîv û axê dua dike û mehrê dibire û ji bûk û zavê re jîyaneke xweş û dirêj daxwaz dike. Mehrbirîna Kurdên Elevî nêzî ya yên Sûnî ye. Bi tenê ew tiştekî naxwînin. Meleyê wan 3 car ji şahidan dipirse ku "keça filan kesî didin lawê filan kesî." ew qebûl in, an na. Ew jî ,"belê" dibêjin. herweha mehr tê birîn û piştre zavê agahdar dikin, ku mehr hatiye birîn.

Lê, niha li bajar û bajarokan her çiqas mehr bi edetên dînî jî bê birîn, li belediyan jî mehra modern dibirin.

Di nav Kurdan de jinberdan heye, lê mêrberdan tune ye. Ango biryar bi tenê ya mêrî ye. Ev jî wek gelek edetên din, ji ola Îslamê ketiye nav kultura Kurdan. Mêr dema li ba 2 kesan, 3 caran ji jina xwe re bêje; *"min te berda"* an jî 3 kevir bavêje, jinik tê berdan û divê ew here mala bavê xwe. Vegera wê jî êdî ne weha hêsa ye; heta mehra wê li yekî din neye birîn, ew nikare were ba mêrê xwe. Ji xwe bi yekî din re mehrbirînê, Kurd hîç qebûl nakin. Lê, baş e, ku mele carnan ji bo riyên vegerê fitwan dibînin û jinên berdayî jî, hewa bi paş ve vedigerin malên xwe.



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

## Parastina bûk û zavê

Zava, di mala birazava de şîva xwe dixwe. Ji dost û mirovê wî, yekî zana û zewicî, zavê dibe cihekî xalî û di derheqê zewacê de hinek şîretan lê dike. Ev şîret jî, li gor her herêm û malbatê tê guhartin.

Dema her der xalî û tarî dibe; zavê digirin û dibin cem bûkê. Li devê dergeh zava, birazava û mirovên wî diçin rûyê hevdu. Zavê diçe oda bûkê û birazava û çend mirovên wî jî, li der nobedariyê digirin. Li hinek herêman dema zavê dixin hundir, xort bi ço û qamçiyan li zavê dixin. Ji wan hinek jî, wî diparêzin. Ne bi tenê birazava, çend mirovên wî yên din jî, li der dora mala zavê bi çek dikevin nobedariyê. Dibe ku dijminê zavê wê şevê bikaribin bavêjin ser mala wan û sosretekê bînin serê bûk û zavê. Li Kurdistanê gelek bûyerên weha çêbûne û dibin. Di dema zewacê de dijmin avêtiye ser wan, zava kuştine, bi çeplên bûkê girtine û revandine. Di vî warî de, strana *Qesra Belek*, di nav Kurdan de her tim tê gotin, ku çawan avêtine ser zavê, wî kuştine û çeplên bûka ter û teze girtine û rakirine çiyê.

Zava diçe hundir. Li gor şîretên şîretkirox bi bûkê re têkilî datîne.

Bi qasî çend saetan paşê, divê zava ji oda bûkê derbikeve der. Ew dema tê der, heger zewicî be, çeka xwe dikişîne û diteqîne. Êdî her kes dizane, ku bûk û zavê zewicîne. Zavê diçe destê mezin û rûyê biçûkan. Ew jî wî pîroz dikin.

Bi derketin û çek teqandina zavê re, jinên mala zavê baz didin hundir ba bûkê û li çarşeba bûkê dinêrin, ka bûk qîz bûye an na. Qîzbûn di nav Kurdan de gelek girîng e. Jin çarşeba bûk û zavê ya xwînî

Institut kurde de Paris

hiltînin. Roja sêrojê nîşanî çend jinan didin. Li hinek herêman, mala bavê bûkê bi dizî pîrejineke dişênin gundê zavê. Yek gumana xwe û wê nake ku ew ji bo çi hatiye. Dema ku dawet dest pê dike wê dişênin gund mala mirov, an nasekî wê yê ku li wî gundî heye. Pîrejin, sibehê diçe mala bûk û zavê û qîzîtî, an jî neqîzîtiya bûkê fêr dibe. Û hema dikeve rê, diçe mala bavê bûkê. Mizgîniya qîzîtiya wan dibe. Mala bavê bûkê dîyariyeke didin pîrejinê.

Lê, heger bûk ne qîz be, gelo çi dibe?

Wê çaxê, gelek tişt dibin. Dibêjin ku dema bûk ne qîz be, aliyê mala zavê, radibin pelaseke reş li bûkê dikin û di wê şevê de dibin teslîmê mala bavê wê dikin. Lê, min qet bûyereke weha nedît. Lê, dema bûk ne qîz be, niha weha nakin; di nav çend mehan de, jê re sedemeke dibînin û wê berdidin. Bi wê yekê hem bûk û hem jî, mala bavê wê zêde di nav xelkê de rezil û şermezar nabin.

Gelek caran zava û bûk nikarin bizewicin. Ji ber ku an biçûk in, an hêj nû hev dîtine, an jî bê tecrûbe ne. Li hinek cîhan dema zava û bûk nezewic in û zava derkeve der; birazava û merovên wî yên ku nobeta wî digirin, tenekek ava sar bi ser ve dirjînin û wî şil dikin. Wî dîsan bi paş ve didişînin cem bûkê. Dema zava dîsan nikaribe bizewice; dibêjin, *zava nemêr e*, an jî "*hatiye girêdan.*" Carnan ev bûyer bi mehan, an jî bi salan dom dike. Ji tirsan û bê tecrûbetiyê carnan zavê ji mêraniyê jî dikeve.

Beyanî birazava tê, bûk û zavê dibe mala xwe ku taştê bixwin. Ji vê taştê re *sertaştê* dibêjin. Li hinek herêman bi tenê zavê dibin sertaştê û bûk li malê dimîne.

# Sêroj

Ji roja sisêyê dawetê re, "sêroj" dibêjin. Li hinek herêman ji sêrojê re dibêjin *"sersênî"* jî. Li gelek herêman jî, ji cihêzên bûkê yên ku dikin sêniyên jinên beşdar re sersênî tê gotin. Sêroj, bi tenê ji aliyê jinan ve, li mala bûk û zavê tê çêkirin. Jin sêrojê bi çarçavan dipên. Mirov dikare bêje, sêroj dîlan û şahiya jinan e û roja dîtina bûk û zavê ye. Her jin dixwaze bûkê bibîne, ka çawan e. Dîlber e, an na! Hem jinên ji aliyê bûkê û hem jî yên ji aliyê zavê, hemû tên sêrojê. Bi piranî ew kesên ku ji aliyê bûk û zavê ve ji bo dawetê hatibûn bangkirin û hatibûn dawetê, jinên wan malbatan tên sêrojê. Li dorhêla Culemêrgê, şabaşa jinan cuda ye. Şabaşa jinan ne di roja dawetê de ye, di roja sersêniyê de, ango di roja sêrojê de ye.

Çi jina ku tê sêrojê bi xwe re sêniyeke tîne.

Sênî çî ye?

Ew jinên ku diçin sêrojê, piranî nanê navrûn, zengilok û loqmikan çêdikin, dikine sêniyên xwe. Sêniyên xwe dikine nav boxçeyeke nexşkirî û digrin bin çengê xwe û diçin sêrojê.

Jin li hundir govendê geş dikin. Bûkê dixemilînin û wê tînin odê nav jinan. Bûk bi rêzê re diçe destê mezin û rûyên biçûkan. Paşê tê li ser kursiyê xwe rûdine. Hemû jin ber û bala xwe didine ser wê û ew di bazara çavan re derbas dikin. Lê, bûk ji şerman serê xwe ji ber xwe ranake.

Bîstek paşê zava û birazava jî, bi zanabûn li der ve peyase dikin. Hinek xeberê didin jinan ku zava li der

Institut kurde de Paris

e. Hingê hinek jin derdikevin der û di bin çavan re, li zavê dinêrin û hinek jî, li pişt perdeyên penceran, li zavê temaşe dikin. Û pirs dikin; *"kîjan ji wan zava ye û kîjan jî birazava ye.?"*

Heta danê êvarê jin govenê geş û germ dikin. Danê êvarê jinên sêrojê dest bi çûna malê dikin. Ji xwediyê malê sêniyên xwe yên vala dixwazin. Li odeya din hemû sênî valakirine û li gor mirovatî û giranbihatiya xwediyê sêniyan, ji cihêzên bûkê sersênî dixin nav wan. Ji hinekan re îşlikek, ji hinekan re cotek gore û ji hinekan re jî, çend serî sabûn ûwd.. datînin. Perûya (sersêniya) bûkê û zava ya herî giranbiha û mezin, xweza ji sêniya mala birazava re ye. Bi kêmasî ji birazava re, ji gore heta kiras, derpê û sol datînin û dikin sersêniya mala birazava. Ji ber ku zehmetî û fedekariya herî mezin birazava kiriye. Bi kurtî pêwîst e, ku hîç sêniyek jî, vala nedine xwediyê wê. Dema mala bavê bûkê, ji bûkê re cihêz nekirîbin, an jî kêm kirîbin, berî sêrojê pêwîst e, ku mala bavê zavê herin bajêr û ji bo sêniyên sêrojê tişt bikirin. Wê çaxê, jinên aliyê mala zavê, roja sêrojê berê top û tifingên xwe didin mala bavê bûkê û di biwara wan de dipeyîvin meselê ji hemû jinan re dibêjin:

"Ev tiştê ku me ji we re danîye, gelek bê qîmet in. Divê hûn li qusûrê me nenêrin. Em çi bikin?! Bavê bûkê ji bo qelend tonek pere ji me girt, lê mixabin du cot gore û du serî sabûn jî, ji keça xwe re nekiribû! Ev jî, me bi pereyên xwe ji bajêr kirine!"

Hemû jin "waxxxx" û "tûh tûhhhh" dikin û dibêjin:

" Wey çîqmezê (cimriyê) heram. Ew pere di gewriya wî de bimîne. De bila canê we sax be. Xwedê miradê bûk û zavê bike! Qîmeta malê dinê tune...."

Jin dema ji mala zavê xatir dixwazin û dikevin rê,

êdî dest bi galegotan dikin û her yek tiştek dibêje:
" Xwedê can û gîyana bavê bûkê bistîne! Te dît xwişka min, ma mirov hewqas jî çîqmez û rezîl nabe. Qîza xwe çîp tazî kirîye bûk û şandîye. Way Xwedê te kojoyî bistîne herê welle billeh..."

" Lê lê xwişkê, ji xwe ew, guyê xwe hişk dike û dixwe. Ma tu wî pûnoyî nasnakî?"

" Pîiii xwişka min, te bûkê dît! Wek darika tenûrê bû.. Reşşşş û qertîş... dibêjî qey ji ber êla qereçîyan girtine û anîne..."

" Lê, zavayo tu çi zavayî! Reben wekî labût e..."

" Na, welle bûk gelek dîlber e û zava jî gelek dîlbaz e...."

## Zeyî

Piştî dawetê sê hefte paşê, ev car ji mala bavê bûkê çend kes bi sênîyek kilorik û nanên nav rûn (nannivişk) ve tên mala zavê. Ji bo zeyî rêdana (îzna) keça xwe dixwazin. Li hinek herêman ji zeyî re *malbav* jî dibêjin. Roja zîyafetê jî dîyar dikin û rêdana keça xwe ji mala xezûr digirin û wê li hespekî siwar dikin û dibin malê.

Êvara zîyafetê bavê zavê, yan jî miroveki wî yê nêz, bangê çend kesên nas û dostên xwe yên giranbiha dike. Zava û birazava jî bi xwe re digirin û diçin mala bavê bûkê zîyafetê. Herweha, bavê bûkê jî gazî hin mirovên xwe dike.

Dema ew digehên mala bavê bûkê, pêşî zavê diçe



*Dayik keça xwe dibe zeyî.*

destê xezûr û xesûya xwe û paşê diçe destê yên din ku li wir hazir in. Hingê zava gelek şerm dike, ew û birazava li dawiya odê, nêzî darê solan rûdinin.

Mala xezûr, ji bo zîyafetê xilik li qafik dixin û mesrefeke pir giran dikin û xwarinîne gelek xweş çêdikin. Êdî li gor hêz û zanîna kevaniyan, çi xwarinên wan ên xweş û tamdar hebin, çêdikin û tînin ber xinamiyên xwe yên nû...

Mala xezûr xelatan didin bûk, zava û birazava. Xelata birazavê biçûk e; lê ya bûk û zavê mezin û hêja ne. Gelek caran ji bûkê re zêrek an pezek û ji zavê re jî, saetek an jî gustîlkeke zêr didin.

Piştî zîyafetê zava, birazava û mirovên wan yên din vedigerin malê. Lê bûk qasî çend rojan li mala bavê dimîne. Paşê mala xezûr, bi dîyariyên xwe ve tên û

bûka xwe dibin malê.

Ta saleke bi wî awayî divê ku mala bavê bûkê her çend hefte an mehê carek bên û rêdana keça xwe ji mala xezûrê wê bigirin û bibin zeyî. Piştî salekî, êdî mala xezûr bi xwe, bûka xwe dibin mala bavê wê. Di çend zeyiyên pêşî de bûk bi siwarî diçe û tê. Lê, her ku bûkîtiya wê kevin dibe, rêzgirtin û hêjatiya bûkê jî kêm dibe. Êdî mêrê wê bi xwe, wê bi peyatî dibe zeyî û tîne.

Institut kurde de Paris

# Ferhengok

**Bacerê:** Xelata di rê de derbasbûn. Gumrika bê resmî.

**Beysûs:** Çireya ku ji darê kutandî tê çêkirin.

**Berdêlî:** Gorîn, ew keçên ku bi hevdu re tên guhartin.

**Berbûkî:** Berbûk, berbûrî.. Ew jinên ku diçin bûkê tînin.

**Bêyomtî:** Bêxêr, bela, qeda

**Bî:** Ew kesê ku jina wî dimre, an jî jina xwe berdide

**Birazava:** Ew kesê ku di dawetê de, ji her alî ve kar û barên dawetê dide ser milê xwe. Li hinek herêmam divê birazava bê jin be û li hinek herêman jî divê bi jin be.

**Cihêz:** Ew tiştên ku bûk bi xwe re tîne mala zavê.

**Bişare:** Qomçe, xwençe, vexwendina bo dawetê

**Çengçî:** Govendgêr, koçek

**Çûyîna ser malê:** Ew kesî ku dema dizewice û mala xwe dibe ser mala xezûrê xwe.

**Darika zavê:** Dara şahiyê ya ku li ser xaniyê zavê tê daçikandin.

**Dîlan:** Govend, dawet

**Dîlok:** Stranên govendê ên kin.

Institut kurde de Paris

| | |
|---|---|
| **Destgirtî:** | Xortê bi xwestî |
| **Derax:** | Sewiye, hîza |
| **Dadist:** | Savci, mûdêyê ûmûm |
| **Danêr:** | Hakim |
| **Desthene:** | Henekirina zavê. |
| **Edetî:** | Normal |
| **Ezepçêrî:** | Ew xortên ku di rojên dawetê de zavê diparêzin. Peyayên zavê. |
| | Keça bi soz. Bi tirkî sözlü. |
| **Herêkirî:** | Biryara dayîna keçikê. "Êrê" gotin. |
| **Herêkirin:** | Ew jina ku bê mêr e. |
| **Jinebî:** | Ew karika ku dibin ser riya bûkê ji bo bacerê distînin |
| **Karika zavê:** | |
| **Koçek:** | Govendgêr, çengçî, hunermendê govendê. |
| **Melhêf:** | Şarik, kitana ku jin didin serê xwe. |
| **Nazbalîf:** | Balgîyên biçûk ên bi nexş. |
| **Nûçe:** | Xeber, deng û behs |
| **Pêşbirik:** | Hemberî,musabeqe, yarış. |
| **Piştderî:** | Dema bûkê ji mala bavê wê derdixin, ji aliyê bûkê yek xwe dixe pişt derî û derî venake ku bûk derkeve, heta ku pere û xelata xwe bistîne. |
| **Pêrû:** | Sersênî, dîyariyên ku bûk belav dike. |
| **Qelend:** | Qelen, qelind, next, ew pere û malên ku di dayîna keçikê de tê girtin. |

Institut kurde de Paris

**Vekirina rûyê zavê:** Piştî hatin û hewlandina bûkê ji aliyê xwendî û berbûriyan ve diyarî tên berhev kirin.

**Rêzdar:** Qedir û qîmet

**Sarî:** Meqamê zirneyê sibehê

**Serhene:** Henekirina bûkê

**Serhevde:** Minet, biçûk û kêmdîtin.

**Serhawe:** Meqamê birêveçûnê û kovan. Meqamê lavjan.

**Şekirşikestin:** Bûyera hilbijartina birazavê ku yek qutiya şekir radike û dibêje; "min şekir şikest û ez biraza me."

**Serûgo:** Heziriya kinc û berên bûk û zavê .

**Şiranî:** Nîşan

**Şanogêrî:** Tiyatro, lîstik

**Teyfik:** Tebeqên ku mirov tê de xwarin dixwe.

**Tirşik:** Ji xwarina dawetê re tirşik tê gotin. Xwarineke Kurdan e. Ji goşt, balîcanên sor û reş û îsotê tê çêkirin.

**Xwînî:** Dema ku du alî an jî du eşîr ji hevdu mêr dikûjin, aliyê ku mêrê yê din dikuje di lihevhatinê de keçikê dide aliyê din. Ev tê wê manê ku êdî bûne mirovên hevdu. Ji vê keça ku ji ber xwînê ve didin hevdu re, dibêjin "xwînî."

Institut kurde de Paris

Batman, Semsûr, Botan Sine, Sêrt, Culemêrg, Hewlêr, Akrê, Qamîşlo û  Badînan nivîsand. Dibe ku giranî li ser herêma Dîyarbekirê be. Ev jî tişteki xweza ye, ji ber ku ez li wir mezin bûm û jîyame. Berî çapkirinê min tekst bi gelekî kesan dan xwendin û dîtinên wan girt. Min çend kaset şandin herêmê û varyantên curbe cur ji dîlok û stranên dawetê berhev kir. Di dema nivîsandina wan de ,min varyanta herî rast bingeh girt. Xweza nîşan û dawetên Kurdan li tevayiya Kurdistanê ji %90 wek hev in. Lê, têveliyên (ferqên) nûansî jî hene. Wek govenda Kurdan ku her bajarekî Kurdistanê folklora xwe ya taybetî heye. Heta di nav du gundên cîran de têveliyên cuda hene. Ez dixwazim vê yekê bidim dîyarkirin, ku min tiştînên ku dît û bihîst orjînala wan neguhart û rastî nivîsî. Dibe ku ji hinek kesan re, hinek tişt seyr bên! Lê, ev jî, ji taybetî, nenavendî û dewlemendiya kultur a neteweyê Kurd  bi xwe  tê.

Ev berhem ji pirtûkeke bêtir wek senaryoyek e. Heger îmkan çêbin û mirov  bikaribe filima wê bikşîne, ez bawer dikim, ku dê bibe efrandineke nemir.

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**amed tîgrîs**
**tebax 1991**
**Stockholm**

**Xweza:** Tebî, doğal

**Xinametî:** Mirovatiya navbera mala zava û bûkê.

**Xelat:** Dîyarî, hedîye, perû

**Xwendî:** Ew mêrên ku diçin bûkê tînin.

**Xwestî:** Keça bi destgirtî, bi tirkî sözlü

**Xwişkebûk:** Ew keçik, an jî jinika ku hemû mesref û alîkariya bûkê digire ser xwe. Ji destpêka dawetê heta dawî, ew li ba bûkê dimîne û jê re dibe heval û alîkar e. Li herêma Licê, ji birazava re dibêjin ezebaşiyê zava û ji xwişkebûkê re jî, dibêjin ezebaşiya bûkê.

**Zeyî:** Piştî birina bûkê, cara pêşî ku bûk vedigere mala bavê.

**Zengo:** Ew xelekên ku bi herdu aliyê zîn ve ne. Zengû.

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris



ISBN: 91 87730 07 0 3
Weşanên APEC

K.L.